

## Tirs û fikar

Şewba koronayê ji xeynî bandora xwe ya biyolojîk rê li ber pirsgirêkên derûnî û tevgeran jî vedike. Girêdayî şewbê panîk, tirs, paranoya, depresyon, tevgerên egoîst, bertekên fobîk dikarin bên dîtin û ev jî wekî vîrusê dikarin belav bibin... *Derûnnas Leyla Nisêbînî / R.2*



## Gundê Hemdûnayê

Hemdûna; di welatê Xaldiyan de yek ji wan gundên herî kewnar e. Ji Êlihê pêncî û ji Qûbînê jî sî û du kîlometreyan dûr e. Di dema xwe ya biro biro de gund şên bûye. Lê mixabin roja îroyîn, di gund de bi tenê pênc malbat dijîn... *Ayhan Erkmen / R.8*



## Vace-Bêje

Demekê ji bo tomarkirina destanekê em çûne li cem dengbêjek Colemêrgê, em rûniştin û me pirsiyarên xwe kirin, dengbêj navberekê li gorî xwe nirxandinek kir, got ku; "Lawje hûn dizanin çi ye? Lawje, law-wêje, law-bêje, law-bêjî ye."... *Kenan Colemêrgî / R.8*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

13-19 Nîsan 2020
Hejmar: 17
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


# Dîrokê nefiroşin û bila çîrok sêwî nemînin

Di van rojan de ku rojeva sereke ya cîhanê şewba koronayê ye, me xwest em hinekî berê xwe bidin mijareke cuda û balkêş: Arkeolojî! Di vê hevpeyvînê de, bi arkeolog Mesut Alp re me dêhna xwe da berhemên dîrokî yên li Mezopotamyayê. Alp ji bo bendava Cizîrê bang kir û wiha got: "Ez niha ji bo bendava Cizîrê ya ku dê nû dest bi çêkirina wê bê kirin, bangî hemû xwendavanên beşa arkeolojiyê, aktivîstên ekolojiyê, rewşenbîr û dîrokhezan tevan dikim! Nehêlin ku bendava Cizîrê were çêkirin. Bi bendava Cizîrê re dê berhemên dîroka Finîkeyê di bin avê de bimînin û dê gund tev dîsa werin valakirin û çîrok sêwî bimînin." Alp got ku xeyala wî ew e ku êdî kurd û gelên qedîm tev dîroka xwe ya li ser vê axê nefiroşin... *Hevpeyvîn Bêrîvan Kayi / RÛPEL - 4*



## Ger vîrus nekuje dê xîzanî bikuje

Em baş dizanin ku li bajarên kurdan hem rewşa aborî, hem jî pergala derman û tenduristiyê pir xirab e. Û dewlet di rojên wiha bi êş de jî dest ji polîtîkayên xwe yên dijminane bernade, dîsan gel bi mirin, xêzanî û bêçaretiyê re rû bi rû dihêle. Ji vir şûnde hewce ye bêyî ku mirov li benda alikariya dewletê bimîne, mirov bikaribe têkiliyeke berfireh ava bike, birêxistinbûna xwe bi pêş bixe... *Zehra Mohammedzadeh / R.2*

# 'Hestiyên te hatine'

Endamê HPG'ê Agît Îpek 3 sal berê li Dêrsimê di pevçûnekê de jiyana xwe ji dest da û piştî 3 salan Serdozgeriya Komarê ya Dêrsimê hestî pakêt kirin û bi kargoyê ji malbatê re şandin. Dayik Halîse wiha got: "Li qereqolê kaxizek dan min tê de 'emanet' dinivîsand. Ez tenê çûm û gotin here di 30'yê mehê de were. Ez ew roj dîsa çûm. Em ketin hundir çûn cihê ku tiştên emanet lê tên wergirtin. Min pirsî ku çi ye emanet? Ji min re gotin 'hestiyên te hatine'...

*RÛPEL - 3*



## Vîrusdewlet û korona

Di vê nivîsê de em ê li ser du cureyên vîrusê bisekinin. A ewilî, îro li seranserê cîhanê belav bûye ku bi navê xwe yê tê nasîn coronavirus e, lê em ê jê re bêjin vîruskorona. Ya duyemîn jî li seranserê Kurdistanê belav bûye ku bi navê xwe yê tê nasîn dewlet e, lê em ê jê re bêjin vîrusdewlet. Her du cureyên vîrusê ji kuştina mirovan hez dikin û ji bo mirovan bikujin li van deran belav bûne...

*Hisên Çatikkaş / RÛPEL - 6*

## Bîlanço giran dibe

Li gorî daneyên dawîn li seranserê cîhanê nêzî 2 milyon kes bi şewba vîrûsa koronayê (Covid 19) ketin û her wiha zêdetirî 100 kes jî mirine. Ligel belavbûna vîrusê daneyên rast ji welatiyan tên veşartin û her wiha hikûmet nêzikatiyeke her tişt di bin kontrolê de ye nîşan dide. Ligel rewşeke wiha jî iktîdar aşkera di xizmetan de cudakariyê dike Bi belavbûna vîrusê re şîdeta li hemberî jinê jî her ku çû zêdetir bû... *RÛPEL - 7*



## Ka şewqeyên we!?

Di hevpeyvîneke Der Spiegelê de ya di sala 1969'an de bi Adornoyî re kirî, guftûgoyeke baldar derbas dibe: "Birêz profesor, wer dizanim ku duhîli dinyayê îş têl bû." Adorno: "Lê ji min ve wisa xuya nedikir."... *Şener Ozmen / R.11*

## Merdimîya Rîpêşine

Çîyo ke ez çend rojî yo ke ser o fikirîyena no yo: Na dinya xeyrcê tebîetî eserê merdiman a. Mefhûm û îcadê newe û musbetî pêro netîceya aqil, xebat û keda merdiman de vejîyê meydan. Yanî sayeyê merdimîye de estê. La merdimîye (însanîye) ewro bi rîpêşan (maskeyan) ciwîyêna. Ma no zî dî: Merdimîya Rîpêşine. Ya, her cayê dinya û her miletî ra qij û pîl, cinî û camêrd, ciwan û kal yanî heme ferdê famîlyaya merdimîye bê rîpêşan cif/solix nêdanê û nêgênê... *Pêşar Bextewer - R.9*

## Helbesta serkêş romana barkêş

Helbest û Roman, wek du birayên hesûd in li mala wêjeya nûjen çarmêrkî rûniştine û ne yên çûyînê ne. Roman giran dimeşe û hêdî hêdî diaxive, helbest çapik e, destsivik e û direqise. Roman behsa şerekî dike lê helbestvan şerker bi xwe ye. Roman xwarin e, helbest pêxwarin e... *Samî Hêzil / R.5*



# Şewba koronayê û bertekên li hemberî wê

Derûnnas
Leyla Nisêbînî



Şewba koronayê ji xeynî bandora xwe ya biyolojîk rê li ber pirsgirêkên derûnî û tevgeran jî vedike. Girêdayî şewbê panîk, tirs, paranoya, depresyon, tevgerên egoîst, bertekên fobîk dikarin bên dîtin û ev jî wekî vîrusê dikarin belav bibin. Her kes di bin bandora van rojên zehmet de ye. Kesên ku ji bo debara xwe bikin derdikevin derve û dixebitin, kesên ku li malê aciz jî dibin, zarokên bêriya hevalên xwe dikin, tev di bin vê bandorê ne.

Şewba koronayê êdî wekî pandemiyê tê binavkirin û bi karesateke gerdûnî tê şîrovekirin. Ji ber ku ev nexweşî bûye gerdûnî, rîska wê ya kuştinê zêde ye û demeke dirêj e didome, em dikarin vê wek krîzê bi nav bikin. Gava qediya em ê jiyana xwe bi çi awayî bidomînin, hê em nizanin. Lê em dikarin li ser rojên niha bisekinin bê ka krîz çi ye, bertekên wê çawa ne û mudaxele divê çawa bin, binirxînin.

Krîz, bûyerek an bûyerên ku êrişî kapasîteya me dikin, li hemberî wê rêbazên me yên çareseriyê kêm dimînin û wekî demeke neyînî û neorganîze, dikare bê pênasekirin. Erdhej, lehî, bobelat, teqîna bombeyan, koçberî û hwd hin mînak in. Krîz ahenga me ya jiyanê xera dike. Aheng çi qasî xera bibe, avakirina ahengeke nû, derbaskirina krîzê jî bi qasî wê zehmet dibe. Şewb (peta) eynî wekî erdhejekê, lehiyekê yan şewatekê ji bo jiyana mirovan tehdîtek e. Loma dikare rê li trawmayên derûnî veke. Heta carinan bandora wan dikare girantir be. Ji ber ku karesatên wekî erdhej û lehiyan di nav çend çirkan an deqeyan de çêdibin û xelas dibin. Lê şewb dikarin bi mehan bidomin. Di malbatekê de dê yan bav, dikare jiyana xwe ji dest bide û tevî şînê talûkeya rîska mirina mirov bi xwe jî wexteke dirêj dikare berdewam bike. Ji ber vê yekê, pergala jiyanê bêhtir xera bikin, bandora wan dikare kûrtir be.

Mijareke girîng jî ev e ku wextên krîzê ne wextên asayî ne, loma hest û bertekên me jî çêdibe ku ne asayî bin. Em nikarin ji xwe û ji mirovan hêvî bikin ku wekî berê tu tiştan nebûye, tev bigerin. Dibe ku pergala xwarin û xewê biguhere yan tehemûla kesan kêm bibe. Divê ev heya astekê asayî bên dîtin.

**Tirs û fikar ji hev cuda ne**

Sedema xemê û stresê ji bo her kesî dibe ku ne yek be. Tirsa her kesî ne yek e ku vîrus dê bigihêje wan û nexweş bikevin. Hinek ditirsin ku karê xwe ji dest bidin. Ji bo hinan rûniştina li malê îmtiyazek e û tirsa wan ew e ku dê nema bikarin debara xwe û ya malbatê bikin. Hinek dûrî dê û bavên xwe ne, tirsa îhtîmala nexweşiya wan û mirina wan streseke ji nexweşiyê mezintir e. Jin heke bi mêrekî êrişkar re li malê be, tirsa zirardîtinê ji ya vîrusa şewbê dibe ku girantir be. Zarokên hinekan astengdar in û tirsa wan ne nexweşî ye, lê fikara wan ew e ku gava nexweş bikevin dê kî li zarokên wan miqate be. Loma sedema xemê ji bo her kesî nikare yek be. Di vir de mudaxele divê li gorî hewcedarî û hesasiyetên mirovan be. Heta derfet hebe ji bo çareseriyê piştevaniya malbatê, hevalan, cîranan û kesên pispor di van rojan de gelekî girîng e.

**Bobelat û hesta neçariyê**

Pêvajoya şewba koronayê îhtîmal e ku bibe sedema bertekên xerabûna stresê ya akût (nexweşiyên zû pê de diçin). Gava takekes bi mirinê re rû bi rû dimîne yan jî dibe şahidê/a mirinê yan jî bobelatên xerab an wan ji derekê dibihîze; hesta neçariyê, bêewlehî, tirs û endîşe pê re peyda dibe. Bi bandora bûyerê û tirsa mirinê ku dewam dike, çêdibe ku xew xerab bibe, xewnereşk zêde bibin, pergala xwarin û vexwarinê xera bibe, bêhtir qehrokî bibin, ramanên nexweş dubare bibin û takekes nikaribe xwe ji wan ramanan xelas bike û pê re jî pêşeroj ji wan re ne diyar bibe. Ev bertekên stresa giran heke hundirê 3 yan 30 rojan de derbas nebe, diqulibe nexweşiya stresê ya piştî trawmayê ku zêdetirî mehekê bi giranî dikare bidome.



**'Dûrbûna fizîkî'**

Hêjayî gotinê ye ku her kes li hember bûyerên zehmet heman bertekan nîşan nade. Bertek li gorî nexweşiyên derûnî ne ku berê jî hebûn, trawmayên berê, di wexta bûyerê de piştgiriya ku ji nas û mirovan hatiye girtin, xisara bûyerê li jiyana takekes û parvekirina hestan diguhere. Wekî ku tê dîtin hêza piştevaniya malbatî yan civakî tim wekî faktoreke erênî derdikeve pêşiya me. Ji bo pêşiya nexweşiyê bê girtin, gava têgeha 'dûrbûna civakî' (mesafeya sosyal) hate gotin, pisporên derûnnasiyê û civaknasiyê xwest têgehê sererast bikin û gotin bedêla 'dûrbûna civakî' divê 'dûrbûna fizîkî' bê gotin. Ji ber ku tam jî van wextan hewcedariya me bi kesên din heye. Mirov çi qasî di van rojan de rewşa hev bipirsin, alî hev bikin, hestên xwe yên wekî tirs û endîşeyê bi hev re parve bikin, ew qasî şensê wan zêde dibe ku xwe ji bandorên neyînî yên mayînde biparêzin.



**Piştevanî bandorê kêm dike**

Rewşa niha em tê de, ev zêdetirî sê heftayan e îzolasyon heye û li her dera dinyayê slogana 'Li malê bimîne' tê berzkirin. Em nizanin wê çi qasî bidome lê halê hazir rîska nexweşiyê berdewam e û tim nêzîk e. Hewce ye em vê qebûl bikin. Divê em pirsgirêkên xwe nas bikin û ji bo wan ji nasan, heval û hogiran piştgiriyê bixwazin. Ji bo ku zehmetiya van rojan kêm bibe, kesên di talûkeyê de ne, divê tenê nemînin. Hewce ye dewlet û civak xwe ji wezîfeyan dûr nexin. Mafên karkeran divê bên parastin, ji bo jin di malê de tehdeyê nebînin, sazî mekanîzmayan aktîf bikin, kesê xizan ji aliyê aborî ve bên piştgirîkirin, hurmet û rêzdarî ji bo kal û pîran bê nîşandan. Ji tirsa nexweşiyê û bandora îzolasyona fizîkî encax em dikarin bi piştevaniyê xwe bi qewet bikin.

---



Zehra
Mohammedzadeh

## Ger Covid-19 nekuje, wê bêkarî û xîzanî bikuje

Îro li cîhanê ji ber vîrusa Covid-19'ê hema bêje jiyan rawestiyaye û pergala bikrîz di nav kirîza ku dijî de li pey rê û rêbaza bihurandina ji vê yekê ye. Lê ne pêkan e pergala bikrîz a moderniteya kapîtalist bikaribe çareseriyê bibîne, ji ber ku sedemên van hemû krîz û nexweşiyan ev pergal bixwe ye. Nexasim di rewşeke wiha de jî pergalên heyî li şûna tedbîran bigirin, di civakan de rê li cihêkarî û pirsgirêkên cuda vedikin.

Helbet yek ji welatê ku herî zêde vîrusa Covid-19 lê belav bû jî Îran e. Rayedarên hikûmeta Îranê ji destpêkê de bi nêzikatiyek ne cidî û ji rêzê nêzî rewşê bûn û tedbîrên pêwîst negirtin. Tinazên xwe li welatên cihê kirin, rastiya rewşê ji gel û raya giştî veşartin, qaşo bi vê yekê xwestin xwe wek dewletek bi hêz pêşan bikin. Lê belê di demeke kin de hat dîtin ku rewş ji ya heyî gelek xirabtir e û nexweşî belavê tevahiya welat bû. Ger di dema xwe de tedbîrên pêwîst bihatana girtin, ne pêkan bû ku encama îro tê jiyîn rû bida. Di destpêkê de rayedarên Îranê li şûna ku bajarên wek Qûmê ku bûyerên vîrusê lê zêde bibûn bixin bin karantînayê û tedbîrên hewce bistînin, gel şaş agahdar kirin û ketin nav şerê ka em çendî bi hêz in. Lê îro ji dema ku em lê dinêrin, em dibînin ku serokkomar Hesen Rûhanî di civîna kabîneyê de da diyarkirin; "Me pêla ewil a vîrusa Covid-19 bihurand. Wek hikûmet me vîrus di 20 sibatê de ferq kir û me di heman civîna xwe de jî ev yek bi gel re parve kir." Di axaftineke xwe de jî Rûhanî dibêje; "Dibe Covid-19 heya mehên li pêşiya me, yan jî heya dawiya salê bi me re be." Her çend Rûhanî di civîna civata wezîran de da diyarkirin ku li hemû bajaran bûyerên Covid-19'ê kêm bûne, lê rewşa heyî berovajî vê yekê nîşan dide.

Kiyanûş Cehanpûr, serokê navenda agahdarkirina Wezareta Tenduristiyê ya Îranê, balê dikişîne ser daneyên herî dawî yên vîrusa Covid-19 û dibêje; "Li gelemperiya welat ên ku heya niha bi vê nexweşiyê ketine 67 hezar 286 û 27 hezar 39 kes jî baş bûne. Û 4 hezar 3 kesan jî jiyana xwe ji dest daye. Di nav 24 saetan de hezar 997 kesên din tûşî nexweşiyê bûne ku ji wan 121 kesan jiyana xwe ji dest daye."

Ev daneyên fermî ên dewletê bixwe jî didin diyarkirin ku berovajî gotina Rûhanî, belavbûna vîrusê hîn berdewam e.

Lazim e em êşare pê bikin ku li rojhelatê Kurdistanê rewş hîn xirabtir e. Agahiyên ji hindurê welat tên, rewşê xirabtir û daneyên ku tên dayîn jî zêdetir nîşan dide. Bi taybetî li bajarên kurdan tedbîrên ji bo tendirustiyê pir kêm in. Ji bo wê jî nexweşî pir zû di nav civakê de belav dibe û derfetên dermankirinê di asta herî jêr de ye. Li bajarê Banê gel ji daneyên fermî yên hikûmetê wêdatir, behsa hejmarek zêde a miriyan dike, dîsan Islamabad a girêdayî bajarê Ûrmiyê bi temamî di qerentînê de ye ku ji sedî 90 şêniyên wê kurd in. Her wiha alîkarî û derfetên ji bo dermankirin û amûrên tenduristiyê hema bêje tune ne. Hin ciwanên kurd bi derfên kêm û inisiyatifa xwe komek avakirine û tiştên zarorî û xurekê digihînin malbatên xîzan ên li Islamabad û gundê Miyawoq a ser bi Ûrmiyeyê ve; girîng e mirov bibêje ku li Islamabadê bi gelemperî gel xîzan û bi zorê debara xwe dike.

Li gor raporek ku ji aliyê hikûmetê ve hatiye amadekirin; hişyar dike ku ji ber bandora vîrusa Covid-19'ê a li ser aboriya Îranê wê nêzî 4 milyon 800 hezar mirov di bin xeteriya jikarderxistin an jî bêkariyê de bin. Lê, îro li rojhelatê Kurdistanê kesên ku tenê bi kasibkariyê debara xwe dikin û rojane xwe li sînorên mirinê didin, rewş hîn giran û kambaxtir e. Gel di van rojên zehmet de ku dewletê bi giştî derketina derve; derveyê bank û tiştên zarorî, hemû tişt qedexe kirine, bi zor û zehmetiyên cidî re rû bi rû dimîne. Ji bo wê, li bajarê Makû: 17, Bûkan: 92, Selmas: 23, Serdeşt: 22, Neqede: 27, Xoy: 189, Ûrmiyê: 327, Piranşer: 23, Eşneweyê: 18, Mahabad: 64, Poldeşt: 6, Çalderan: 5 bûyerên nexweşiyê bi awayek fermî hatine diyarkirin ku agahiyên em digihîjinê, hejmar ji vê zêdetir nîşan dide. Jixwe ev dane roj bi roj zêde dibin. Ger rewş wiha bidome wê gel rastî rewşên girantir bê, ji ber ku li bajarên kurdan gel ji bo debara rojane xwe li her karê bi zehmet û xetere dide. Rewşa heyî jî nîşan dide, ger li rojhilatê Kurdistanê Covid-19 gel nekuje, wê bêkarî û xîzanî bikuje.

Em baş dizanin ku li bajarên kurdan hem rewşa aborî, hem jî pergala derman û tenduristiyê pir xirab e. Û dewlet di rojên wiha bi êş de jî dest ji polîtîkayên xwe yên dijminane bernade, dîsan gel bi mirin, xêzanî û bêçaretiyê re rû bi rû dihêle. Ji bo wê jî girîng e ku di pêşengiya ciwanan de, civaka me ya kurd xwe baş bi rêxistin bike û hemû pêdiviyên xwe bi pergaleke kolektîf dabîn bike.

Ji vir şûnde hewce ye bêyî ku mirov li benda alikariya dewletê bimîne, mirov bikaribe têkiliyeke berfireh ava bike, birêxistinbûna xwe bi pêş bixe; bêyî ku derketina derve bike hincet, amûrên heyî baş bi kar bîne û toreke berfireh a danûstandin û alikariyê bike. Ji hêla tendurstî, dermankirin û alikariya ji bo xwirekan, di her hêlê de civak xwe bigihîne astekê ku dikaribe ew bi xwe bi kêrî xwe bê.

# Bi kargoyê hestî ji malbatê re şandin

Serdozgeriya Komarê ya Dersimê cenazeyê endamê HPG'ê Agît Îpek ku 3 sal berê di pevçûnekê de jiyana xwe ji dest dabû bi kargoyê ji malbata wî re şand. Her wiha nehiştin dayik tevli merasîma cenazeyê kurê xwe bibe

Navenda Nûçeyan

Ji aliyê dewletê ve gelek caran li dijî cenazeyan bêhurmetî hatine kirin. Herî dawî jî li dijî cenazeyê Agît Îpek (Kemal Berxwedan) ê HPG'yî bêhurmetiyeke ku heta niha li tu dera cîhanê nehatiye dîtin, hat kirin.

Nûçegîhanên Ajansa Mezopotamyayê (MA) Fahrettîn Kiliç û Ayşe Surme, 10'ê nîsanê derxistin holê ku Serdozgeriya Komarê ya Dersimê cenazeyê Agît Îpek bi pakêtek kargoyê ji malbatê wî re şandiye. Li gorî nûçeyê; Agît Îpek, di 23'yê gulana 2017'an de di operasyoneke leşkerî de li Girê Xelasor a Dersîmê jiyana xwe ji dest daye. Piştî ku encama testa DNA'yê li Saziya Tipa Edlî (ATK) ya Stenbolê diyar bûye, Serdozgeriya Komarê ya Dersîmê, di 2'yê adarê de cenazeyê Îpek dike pakêtekê û bi rêya PTT'ê ji Serdozgeriya Komarê ya Amedê re şandiye. Di 10'ê nîsanê de cenazeyê Îpek, di pakêta kargoyê de radestî malbata wî ya ku li taxa 5 Nîsanê ya navçeya Rezan a Amedê rûdinê hat kirin.

**Nehiştin dayik defin bike**

Malbata Îpek piştî ku cenazeyê kurê xwe bi vê awayekî sosret girt, di heman rojê de li gundê Tizyan ê navçeya Artûklû ya Mêrdînê defin kir. Di dema birina cenaze de cendirmeyan gundê Tizyanê dorpêç kir û nehiştin gundî tev li merasîma definkirina cenaze bibin. Cendirmeyan nehişt ku dayik Halîse Îpek jî tev li karên definkirinê cenazeyê kurê xwe bibe. Ji bo definkirinê tenê destûr dan 3 kesan.

**Cenaze û dosyaya veşarî**

Dayika Îpek Halîse Aksoy, têkildarî awayê dayîna cenazeyê kurê xwe axivî û destnîşan kir ku beriya mehekê ji Edliyeya Amedê lê geriyane û jê re gotine 'dosyayeke te heye were rahêje dosyayê' û wiha got: "Piştî telefon kirin min pirsî ku ji bo kurê min e an na. Gotin dosyayeke veşarî ye tu dê werî teslîm bigirî. Min ji wan re got 'heke ya kurê min be ez dikarim bi teyarê werim.' Dûre dîsa geriyan gotin 'navnîşana xwe bide em bişînin wê derê.' Zavayê min navnîşana xwe da. Deh roj



wisa derbas bûn vê carê ji Dozgeriya Dersimê geriyan gotin 'me dosyaya te şandibû Amedê dîsa li me vegeriyaye. Wan jî got dosya veşarî ye em nikarin ji te re bêjin. Dosya dîsa şandin Amedê. Beriya 12 rojan dîsa li min geriyan gotin were Qereqola Polîsan a Rêzanê. Ez çûm wir gotin 'em ê kaxizekê bidin te tu dê biçî edliyê dosyaya xwe bigirî. Kaxizek dan min tê de 'emanet' dinivîsand. Ez tenê çûm. Lê min negirtin hundir û gotin here di 30'yê mehê de were. Ez dîsa zivirîm malê. Heta îro cardin çûm. Em ketin hundir çûn cihê ku tiştên emanet lê tên wergirtin. Min pirsî ku çi ye emanet? Ji min re gotin 'hestiyên te hatine'. Min lê nêrî ku di pakêtê de ne, PTT li ser nivîsandî ye. Bi riya PTT'ê anîne û birine. Min rahişt pakêta xwe û hatim malê."

**Nirxên mirovî nemane**

Aksoy da zanîn ku çi dibe bila bibe cenazeyên mirovan bi rêya PTT'ê divê neyê şandin û ev tişt anî ziman: "Min hîs kir ku ev ji mirovahiyê derketine. Nirxê mirovan û wijdan li ba wan nemaye. Tê wateya ku em dibin zilm û zorê de ne. Dîn, îman nayê bîra wan. Me zarokê xwe bi belengazî xwedî kir dawiyê hestiyên me birin û anîn bi kargoyê şandin. Ez nizanim li dijî vê yekê bêjim çi. Em ne li benda vê hovîtiyê bûn. Min got rojekê cenazeyî bidin jî wisa nadin. Me nizanî ku dê wek paketê bi PTT'ê bişînin."

## Hişmendiya li hemberî mirovahiyê

DBP'ê jî bi sernavê "Nelet li zîhniyeta we ya dijminê kurdan bê" ev daxuyanî da: "Li gel hemû hewldanan jî 3 sal bûn cenazeyê Agît Îpek nedihat dayîn. Vê pêvajoya vîrusê ku herkes ketiye mala xwe ji xwe re kirin firsend û bi dijminahiyeke weke wehşetê dikare bê binavkirin cenazeyê Agît Îpek bi kargoyê ji malbata wî re şandin. Em ê li dijî vê zîhniyeta we ya li dijî mirovahiyê têbikoşin û heta ku vê zîhniyeta we ji hucereyên mirovahiyê hilneweşînin jî nesekinin. Em vê zîhniyeta we şermezar dikin û diyar dikin ku em li cem gelê xwe ne."



PTT A.S. (POSTAKARGO/NORMAL)
Kabul Isyeri
TUNCELI / TUNCELI
Tarih/Saat 02/03/2020/14:32
Ongorulen Teslim Tarihi
GONDERICI
CUMHURIYET BASSAVCILIGI
2019/1842 SOR
TELEFON:
MERKEZ/TUNCELI
KP02532544687
ALICI
CUMHURIYET BASSAVCILIGI
TALIMAT BUROSU
TELEFON:
MERKEZ/DIYARBAKIR
Ek Hizmetler
GUZERGAH
ELAZIG(K)
DIYARBAKIR(K)
Poset Aparat No
Malzeme Kodu
Odeme Sekli
NAKIT
Gonderi Ucreti
45.20
Toplam Ucret
45.20 (D)
Agirlik/Desi: 3460/16.43
Gonderi Kapsaminin Ayrintili Tanimi :
Gonderileriniz 6475 sayili Posta Hizmetleri Kanununa gore PTT A.S. sorumlulugundadir.

## Di tu ol û civakan de nehatiye dîtin

MEBYA-DER'ê jî diyar kir ku ev rewş dijminatiya li hemberî kurdan a asta herî jor e û ev tişt got: "Kesên ku ji xwe re bibêjin mirov dizanin ku ehlak û hiqûqa şer heye. Ev erdnîgarî bû şahidê gelek şeran lê tu caran li cenazeyan bêrêziyeke wisa nehatiye kirin. Bila her mirov ji xwe bipirse heke cenazeyên zarokên wan bi kargoyê ji wan re were dê psîkolojiyeke çawa bijîn? Bê ehlakiyeke wisa di hiqûqa dijminatiyê de jî nîne. Di dîrokê de tu ol û civakan ji mirî re bêrêzî nekiriye. Ev nêzîkatiya derveyî mirovahiyê em şermezar dikin. Mirovahiyê vedixwînin têkoşînê li dijî vê hişmendiya nexweş a dijminatiya kurdan dike."

## Di vê sedsalê de cenaze tên pakêtkirin

Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) destnîşan kir ku dewlet hemû nirxên sincî binpê dike û ev tişt got: "Di şerên hoveber de jî rêzgirtina ji mirî û veşaretina mirî re maf e. Di sedsala 21'emîn de cenazeyê mirovan tê pakêtkirin û ji malbatên wan re tên şandin. Ev pêkanîn di tu pirtûkeke pîroz, hiqûq û civakê de tune ye. Divê ku sînor ji nijadperestî û dijminahiyê re jî hebe. Tu bawerî, çand û neyartî pekanîneke bi vî rengî qebûl nake. Em vê pêkanîna li dijî mirovahiyê şermezar dikin û ji wijdanê mirovahî, rêxistinên mafên mirovan û civaka navneteweyî re dihêlin."

# Tenê nav sererastkirin e



Navenda Nûçeyan

Sererastkirina înfaza cezayan ku ji 11 qanûn û 70 xalan pêk tê, di 4'ê nîsanê de li Komîsyona Edaletê ya Meclisê hat qebûlkirin. Beriya qebûlkirinê, li ser xalên 11 qanûnan di navbera partiyan de gelek nîqaş hatin kirin. Li gel nîqaşên ku hatin kirin jî AKP-MHP'ê ji ber hejmara xwe ya zêde sererastkirin weke xwe ji komîsyonê derbas kir.

Sererastkirina înfaza cezayan piştî derbasbûna ji komisyona edaletê, roja 7'ê nîsanê hat lijneya giştî ya meclisê. AKP-MHP bi vê sererastkirinê dixwazin alîgir û hevkarên xwe yên hatine girtin, bidin berdan. Dixwazin siyasetmedar, rojnameger, akademisyenên dijberên xwe jî terkî mirinê bikin.

**Sererastkirin şermezar kirin**

Ji ber vê helwesta AKP-MHP'ê, li lijneya giştî di navbera partiyên muxalefetê û AKP-MHP'ê de li ser xalên sererastkirinê nîqaşên tund hatin kirin. Koma HDP'ê roja destpêkê ya hevdîtinên li ser sererastkirinê, li lijneya giştî çalakî li dar xist û sererastkirin şermezar kir. Roja duyemîn jî Koma HDP'ê, bi meşekê sererastkirina AKP-MHP'ê şermezar kir.

Di hevdîtinan de HDP û CHP bi muxalefeteke tund li dijî pakêta ku AKP-MHP dixwazin tenê 90 hezar girtiyan berdin derketin. Parlamenterên her du partiyan jî di axaftinên xwe de bal kişand ser rewşa girtîgehan û girtiyan û daxwaz kir ku li gorî şertê wekheviyê siyasî tev li sererastkirinê înfaza cezayan bên kirin û bên berdan.

**Girtiyan serî hilda**

Di nav hefteyê de li Girtîgeha Tîpa M a Êlihê jî li dijî sererastkirina înfaza cezayan ku cihêkariyê dike, girtiyan serî hilda. Serhildana girtiyan saetên berê êvarê dest pê kir û heta derengiya şevê berdewam kir. Girtiyan agir berî qawişên xwe da û li dijî sererastkirina înfaza cezayan a newekhev derketin.

Piştî bi saetan girtiyên ku serî hilda hatin qanihkirin û serhildan bi dawî bû. Ji ber ku serhildana girtiyan girtîgeh kir rewşeke ku nikare bê bikaranîn, girtî sewqî Girtîgeha T4 a Amedê hatin kirin. Di sewqkirinê de û li Girtîgeha T4 a Amedê girtî hatin derpkirin. Rêxistinên sivîl ên ku serhildan û sewqkirina girtiyan şopandin jî ragihand ku girtî bi awayekî hovane hatine derpkirin.

**Serlêdana bo Îmraliyê red kirin**

Dîsa serlêdana parêzerên Buroya Hiqûqê ya Asrinê ku ji bo agahîgirtina tevdîrên ku li Girava Îmraliyê ji bo muwekîlên wan Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, Hamîlî Yildirim, Omer Hayrî Konar û Veysî Aktaş hatin girtin, bigirin jî hat redkirin. Serlêdana ji bo hevdîtina bi telefonê jî bi hinceta "biryara sînordarkirina 6 mehan" hat redkirin.

Ji ber van helwestên AKP-MHP'ê yên li dijî girtî û girtîgehan, gelek rêxistinên sivîl jî di nav hefteyê de gelek daxuyaniyên nivîskî weşandin. Rêxistinan nêzîkatiya AKP-MHP'ê ya sererastkirina înfaza cezayan şermezar kir û xwestin ku bergiriyên pêwîst li girtîgehan bên girtin û hemû girtî bi sererastkirina îfaza cezayan re bên berdan. Di pêvajoya ku sererastkirina înfazê li lijneya giştî ya meclisê dihat nîqaşkirin de 2 girtiyan jiyana xwe ji dest da. Girtiyê 70 salî Mehmet Yeter li Girtîgeha Tîpa T a Bafrayê ji ber vîrusa koronayê jiyana xwe ji dest da. Girtiyê din jî Alî Erdogan ê 17 salî ye li Girtîgeha Şakranê dima û tê îdiakirin ku întîhar kiriye.

## BI BENDAVA CIZÎRÊ DÊ DÎROKA FINÎKEYÊ DI BINÊ AVÊ DE BIMÎNE

# Bila çîrok sêwî nemînin

→ Bêrîvan Kayi

Xeyala min ew e ku rojekê ez lêkolînekê li Mêrdînê bikim û yek li min bigere bêje vaye me li Rojava li Girê Moza (Amûdê) bermahiyek dîtiye û ez wê rojê siwar bibim herim Amûdê wê bermahiyê û ya xwe bidim ber hev û wan qiyasa bikim

### Mesut Alp kî ye?



Di 1980'yan de li Nisêbîna Mêrdînê ji dayik bûye. Ji Zanîngeha Egeyê Beşa Protohîstorya û Onasya Arkeolojisi derçûye. Piştî mastirê li Muzexaneya Mêrdînê wekî arkeologekî pispor dibe berpirsiyarê lêkolînên herêmê. Sala 2014'an ji bo perwerdeyê demekê li Zanîngeha Londrayê dixwîne, piştre jî li zaningeheke Amerîkayê perwerdeya xwe berdewam dike. 20 sal in wek arkeologekî pispor dixebite. Niha li Fransayê dijî.

*Di van rojan de ku rojeva sereke ya cîhanê şewba koronayê ye, me xwest em hinekî berê xwe bidin mijareke cuda û balkêş: Arkeolojî! Di vê hevpeyvînê de, bi arkeolog Mesut Alp re me dêhna xwe da berhemên dîrokî yên li Mezopotamyayê. Li aliyekî Girê Miraza li aliyê din tunekirina Heskîfê...*

***Çi li te bandor kir ku dest bi arkeolojiyê bikî?***

Di zaroktiya xwe de bala min li ser dîrok, çîrokbêjî û dengbêjiyê hebû. Min her çîrok rast qebûl dikir. Ya rast malbata min dixwest ez bibim an sîyasetmedar an jî parêzer lê dilê min bixwe tune bû. Piştre li Mêrdînê lêkolîneke arkeolojîk destpê kir ku navê vir Nebûla-Nisîpîs-Naşîpînabû. Bi vê lêkolînê re jî min biryar li ser arkeolojiyê da. Êdî piştî wê havîna ku min bêhna axê û kelecana lêkolînê jiya, min fêm kir ku arkeolojî ne ew bû ku di zanîngehê de ji me re dihat gotin. Hewce ye îdeolojiyeke we hebe û bi nêrînekê hûn meyze bikin. Sedema din jî wek kurdekî, arkeolojî derfetek bû ji bo ku ez dikaribim destê xwe bidim reh û dîroka xwe. Sal bi sal di nav arkeolojiyê de min ferq dikir ku ne zimanê min heye ne jî herêma ku bi hezaran sal in ez lê dijîm, di nav vê dîrokê de hebû! Qet ji bîra min naçe, wextekî mamoste bihîst ez ji Mêrdînê me, ez rakirim û bi min çanda xaniyên kerpîçan da vegotin. Piştî vegotina min a xêniyên kerpîçan, mamoste ji polê re gote we tevan niha çêkirina xaniyekî beriya 8 hezaran guhdar kir. Di wê kêliyê de ez fikirîm ku her kes dersê dibîne lê ez dijîm.

***Tirkiye li aliyekî Girê Miraza (Gobeklîtepe) populer dike, li aliyê din jî berhemên dîrokî yên mîna Heskîfê jî tune dike. Tu vê nêzîkatiya dubend çawa dinirxînî?***

Girê Miraza ango Xerawreşk tenê bi serê xwe mijareke berfireh e helbet. Li gorî kronolojiya ku du sed sal berê zanista arkeolojiyê ava kiriye, bermahiyên Girê Miraza ev kronolojî serobino kir û wiha ji zanistê re got, bicîhbûn û avakirina gundan beriya mîladê 10-12 hezar sal berê destpê dike. Tabî li vir tişta derkeve pêşiya me jî ev e ku pergal bi mantiqeke ticarî ango kapîtalîst li Girê Miraza meyze dike û ji ber wê jî niha ev cihên dîrokî yên din tu carî wiha populer nakin. Di dîroka dewletê ya sed salî de em dibînin ku heta niha tu carî qiymet nedane arkeolojiyê. Di wexta Mistefa Kemal de ji bo ku dewlet nijaddewleta xwe ava bike berê xwe dide arkeolojiyê. Pêdiviya wan bi arkeolojiyê hebû ô zanîbûn ku avakirina qewmekî bi dîrokê ve girêdayî ye. Yanê çi qas li hesabê wan were hewqasî qîmetê didin. Heskîf vêca çîrokeke din e. Berî bendava Ilisûyê, ya Bîrecîkê, ya Kargamişê, ya Atatûrkê, ya Kebanê gelek zêdetir bendav hatin çêkirin û bi sedan bermahiyên arkeolojîk di bin avê de hiştin. Ne aktivîstî, ne mirovekî rewşenbîr, sîyasetmedar tu kesî dengê xwe li hember vê qirkirna dîrokî bilind nekirin. Mînakeke din Semsûr bermahiya çiyayê Nemrûtê yanê Samsata ku beriya mîladê bi du hezar salî wekî ciyekî navenda cîhanê tê bikaranîn, hat tunekirin. Newala Çorî, Hallan Çemî, Zeugma (Bîrecik), Girê Heskîfê, Gizirhoyuk, Çattepe, Başûrhoyuk, Turbehoyuk piştî wê bi sedan cî di bin bendava Ilisûyê de man! Bi sedan malên dîrokî bi şerê Sûrê re hatin talankirin tu kesî dengêxwe dernexist. Heskîf jî bû yek ji wan qirkirinan mixabin. Kesên ku malên wan diketin ber bendavê jî ji ber hê zêdetir jî îstîmlakê pereyan bistînin, dar çandin û xanî avakirin. Ev giştik kêmasiyên me ne û nêzîkatiya me ya li hember dîrok û çanda me ye. Yanê dîroka Mezrabotan ne dîroka kurdan tenê ye, ya gelên qedîm tevî ye lê tu kesî dengê xwe li hember van qirkirinên dîrokî dernexist. Çêkirina bendavan tê wateya bêavhiştina civakê jî. Ez niha ji bo bendava Cizîrê ya ku dê nû dest bi çêkirina wê bê kirin, bangî hemû xwendavanên beşa arkeolojiyê, aktivîstên ekolojiyê, rewşenbîr û dîrokhezan tevan dikim! Nehêlin ku bendava Cizîrê were çêkirin. Bi bendava Cizîrê re dê berhemên dîroka Finîkeyê di bin avê de bimînin û dê gund tev dîsa werin valakirin û çîrok sêwî bimînin. Çîrok sêwî bimînin zarok bê dê û bav dimînin. Li ser bendava Cizîrê jî niha em li ber xwe didin û ez hêvîdarim ku em ê projeyek mezin çêbikin ku cîhan bala xwe bide ser wir.



***Herî dawiyê ji bo çanda dayikên xwedawend hin lêkolîner îdayên din ên mîna ku "peykerên xwendawendan ne îdol in, divê ku ji bo zarokan wekî pêlîstokan hatibin çêkirin" kirin. Tu vê yekê çawa dinirxînî?***

Di lêkolînên dawî yên li Mezra Tel Leyladê (Riha) de tenê di bermahiyeke heyama neolîtîkê de nêzî 400 heb îdol ango peykerên fallusan (penîs) hatin dîtin. Dîsa li Rihayê peykerekî beriya deh hezar salan hatibû çêkirin di bin asasê xaniyekî de hat dîtin. Ev peykerê ku ji her ûzvê wî diyar e mêrekî destê wî li ser fallûsê wî hatiye teswîrkirin. Di hin lêkolînên Anatolyayê de jî peykerên bi vî rengî hatin dîtin. Fikr û îdolên li Girê Miraza ên ku heta niha derketin ser rûyê erdê hemûçik mêr in. Li ser van bermahiyan jî êdî lêkolîner şîroveya ku "gelo ev çanda xwedawendiyê tune bû?" dikin. Bermahiya herî kevn Girê Miraza ye ji ber vê ez vê mînakê didim. Li du deverên Girê Miraza lêkolîn tên kirin. Yek jê ciyê ji bo îbadetê ye, cihê din jî cihê sivîlan ango yê gel e. Di ciyê olî de bermahî hemûçik mêr in, di yê gel de jî bermahî hemûçik yên jinan e. Wisa xuya dike ku piştî 2-3 hezar salan jî cihê olî xera bûye û ji wir koçberiyek destpê kiriye. Di koçberiyê de xuya dibe ku mêr mane û jin ketine rê. Ji van peykerên jinan ên ku bedena wan qelew hatiye teswîrkirin jî (nîşaneya bereketê ye) belav bûye. Ji ber vê yekê ez bi xwe piştgiriyê nadim wê teza ku dibêjin "ev ne îdolên xwedawendane, pêlîstok in". Lê ew teoriya me ya ku tê gotin demekî tenê jin serdest bûne, bi van bermahiyên dîrokî têk çû, jin tenê ne bi serê xwe bû, ew û mêr bi hev re û wekhev dijiyan. Di dema Girê Miraza de di hemdemiya xwe de mêr bi qewetir û zêdetir xuya dibe lê ji ber ku ev çanda olî wê demê zêde belav nabe xelas dibe û wekheviya jin û mêr derdikeve pêş. Jixwe ev yek bi serê xwe jî tê wateya ku jin weke hebûneke pîroz hatiye qebûlkirin ku wekhevî pêşketiye bi ya min. Em vê çandê li Çatalhoyukê (Konya) jî dibînin piştre, li aliyekî çanda xwedawendiyê ya ku bi îdolan (peykerên jinan), li aliyê din jî li ser dîwaran xêzên nêçîrvaniyê hene. Yanê bi kurtasî ji sedî sed ne xwedayên jin ne jî yên mêr bûn. Yanê îdolên jinan ne pêlîstokên zarokan e, yên jinan e.

***Li Tirkiyeyê çima tu nirx nadin arkeolojî û arkeologan?***

Ji ber ku nasnameya ango netewedewleta tirkan tenê beriya sed salan hatiye avakirin. De ka em dêhna xwe bidin dîroka vî welatî; Girê Miraza xwedî dîrokeke 11 hezar salan e, Çayonû 6-7 hezar sal e, Çatalhoyuk 8 hezar sal e, Hîtît 3-4 hezar sal e, yanê tu li van kîjanan meyze bikî jî li gorî kirasê dîroka tirkan zêde fireh hatiye. Ji ber vê jî ev hişmendî ti pêwîstiyê bi lêkolîn û lêkolîneran nabîne û li cem wan taybetmendiya arkeolojiyê jî tune ye. Stenbol bajarê Bîzansan e, İzmîr yê Lîkyayê ye (Yewnanî) û bi hezaran bajarên li Anatolyayê yên antîk hene lê dîroka wan di ser guhê re diavêjin. Em ne wisa ne, mînak dema ku eskerê tirkan, an jî eskerê osmaniyan dihatin ser axa me, me wê demê jî ji wan re digote 'eskerê romê' ji ber ku me dizanîbû Anatolya tev ya Yewnan û Romayê bû. Mînak dema ku Mewlana Celaleddîn hatiye li Iconîumê (Konya) maye ji ber ku ew der ciyê rûman e, jê re Mewlana Celaleddînê Rûmî hatiye gotin. Yanê qewmiyetên mîna tirkan ên bi îdeolojiyên nijadperestiyê hatine avakirin ti eleqe û meyla wan li ser dîrokê tune ye, ji ber ku dîrok ne dîroka wan e.

***Di devera ku zanista arkeolojiyê nikarî be şîroveyê bike sembolîzm dikeve dewrê de yanê çîrok ango mîtolojî. Gelo di navbera çîrok-mîtolojî û arkeolojiyê de têkiliyek çawa heye?***

Mîtolojî argûmaneke arkeolojiyê ye, çîrok herêmî ne, em dikarin bêjin ku ji şiklekî mîtolojiyê zayî ne. Ji ber ku ji mîtolojiyan mirov dikare çîroka çê bike li gorî pêdiviyên herêmî, li gorî hewcebûnên herêmê li gorî çanda wê tên bi kinckirin û çîrok wisa ava dibin. Mînak çîrokeke li Almanyayê ya bi navê Mizikçiyên Bremenê ya ku qala kerekî, dîk û kûçikekî dike. Ê eynî bi vî şeklî pîrik û bapîrê me jî ev çîrok ji me re digotin. Wê çaxê mirov ferq dike ku ev mesele tev ji xalekî têr dibe. Ez vê yekê wekî tiriyê hirsimî dibînim. Dema ku hun libek tirî jê bikin û bidin ber tavê dê wê çaxê xuya bike ku sîsik û ava wê jî heye yanê bi serê xwe dinyayek e ew lib. Dema hişk bikin, biçînin, bi dar ve bikin jî wê deme jî dê bibe dêlî. Her qeym, her çîrok û her çand mîna liba tirî bi serê xwe cîhanek e û haya wan jî ji hev tune ye ku her yek jî ji goşiyên tîrî ne. Çîroka keştiya Nûh li Babîlê, li Amerîkaya Latînî û li Japonyayê jî em dikarin bixwînin. Ji ber vê yekê arkeolojî berê xwe dide çîrokan jî. Çîrok di tariyê de şewqeke ji bo arkeolojiyê. Gelek çîrok li ser civakê peyamên siyasî, aborî û peyamên civakî didin. Yanê em dikarin bêjin ku ji kêmasiyan jî çîrok hatine ava kirin çi tûnebûyînan ango ji hewcebûnên herêman pêkhatine û jixwe di van xalan de derdikeve holê ku çavkaniya herî xurt ji bo arkeolojiyê çîrok in.

***Ji bo pêşeroja arkeolojiya Mezopotamyayê xewn û xeyalên te hene?***

Yekemîn daxwaziya min ew e ku şerê li ser axa Mezopotamyayê tê kirin û hişmendiya mîna DAIŞ'ê bi dawî bibe. Li ser vê axê tim ev diyalektîk xuya kiriye; li aliyekî kuştin, li aliyê din jî afirandin heye. Xeyala min ew e ku rojekê ez lêkolînekê li Mêrdînê bikim û yek li min bigere bêje vaye me li Rojava li Girê Moza (Amûdê) bermahiyek dîtiye û ez wê rojê siwar bibim herim Amûdê wê bermahiyê û ya xwe bidim ber hev û wan qiyas bikim. Û bêşînor jî wir derbasî nav bermahiyên Hewlêrê bibim û qiyasa wan jî bi ya Amûdê û bi ya Mêrdînê re bikim; ji wir derbasî Wanê bibim û hinek penîrê sîrik bixwim û berê xwe bidim Serhedê û dîsa vegerim Amed û Nisêbînê. Xeyala min ew e ku êdî kurd û gelên qedîm tev dîroka xwe ya li ser vê axê nefiroşin. Ez hêvîdar im ku ev hevpeyvîna me di serê her kurdekî/ê de bibe pirsek û berê xwe bide dîroka xwe. Dîrok nîn be jî berê xwe bide çîrokên dê û bav û pîran; çîrok nîn be jî berê xwe bide pişta xaniyên xwe.

# Me tekmîl dikir ziman


Mela Mihyedîn

Dema mirovên pêşî derketin ser rûyê dinê bi awayekî êltî û koçbertî tevdigeriyan, tu hest û baweriya wan a hevpar nebû. Yên ku ew bi hev girêdidan menfeet û bavikên wan bûn. Ne ziman û ne jî neteweyîtî li gel wan hebû. Tirsa wan ji xwezayê bû û ji xwe re xwedayên têkildarî xwezayê diafirandin.

Piştî çandina genim û niştecihbûna mirovan pêre pêre gelek tişt hatin guhertin. Hêdî hêdî baweriyên yek xwedayî (monoteîzm) derketine pêş û li şûna baweriyên pirxwedayî (polîteîzm) cih girtin. Li gel yek xwedayîtiyê pir xwedayîtî jî didome lê wek berê popûlerîteya wê nemabû. Êltî û baviktî jî bi demê re cih dide bajarperestiyê. Bajarpersert, hawirdorên bajarên xwe bi bedenan dorpêç dikin ku bi rehetî axa xwe biparêzin.

Mirovên bajarperest ji bo ku bajar û baweriya wan bi ser bikeve gelek caran bi cîranên xwe re ketine şer û bi vê yekê gelek komkujî qewimîne.

Lê mirov bi xêra peresanê (evolutîon) bi demê re bi aqil dibin û ji şaşiyê xwe vedigerin. Peresana mirovan di dewra ronesans, reform û di şoreşa Fransayê de zexm dibe û mirovên berê bi awayekî aqilane hay ji netewebûna xwe, hay ji zimanê xwe dibin û ji bo van her duyan dest bi xizmetan dikin.



Li Îtalyayê Dante Alîgharî, li Almanyayê Leîbnîz ji bo zimanê xwe yê neteweyî gelek xizmet kirine û bingeha zimanên xwe yê neteweyî amade kirine. Li ser zimanê neteweyî nasnameya xwe ya neteweyî ava kirine.

Dîrok xwe dubare nake lê gelek caran sedem û encamên bûyeran dişibin hev. Hewce ye em dîrokê baş fêr bibin û em ji xwe re ji dîrokê şîretan bigirin ku em nekevin nav şaşiyan û ev şaşî ji me re nebin zebanî.

Bi heman awayî Kurdistan û hemwelatiyên wê jî di eynî xeta dîrokê de derbas dibin. Sedsala 20’an û destpêka ya 21’î ji me kurdan û ji Kurdistanê re serdema navîn (serdema reşî û tarîtiyê) bû. Piştî serdema navîn ango piştî zivistanê timî bihar û xweşî tê. Lê hewce ye em bingeha vê bihar û xweşiyê ji xwe re amade bikin da ku ji bo pêşerojê hem em, hem zarokên me û hem jî zurîyeta me feydeyek baş jê bibînin.

Lewma şertê pêşî, ji me re ronensansîst û reformîst pêwîst in. Gel û dewletên Ewropayê bi xêra van ronensansîst û reformîstan gihaştin xêr û xweşiyê. Hemce ye em jî wekî wan li aqilmendên xwe xwedî derkevin û wana derxin pêşberî civaka xwe. Li her derê hewce ye em reklama wan bikin da ku fikrên wan zû belav bibin. Her çiqasî em zû bikin xebat, ew çend em ê zû bighîjin welêt.

Pîrê dubeytiyan Baba Tahir, şêxê evînê Melayê Cizîrî, zimanperest Ehmedê Xanî û yên din… Van camêran bingeha ziman û nasnameyê danîne û ya din dikeve ser milê me tevan. Hewce ye em xaniyê xwe li ser vê bingeha saxlem ava bikin.

Teyrên Ebabîl nayên hawarê û “Hawar” 15'ê gulana sala 1932’yan olan da. Ma hîn hûn li benda çi ne!

Xanî rê nîşanî me daye:

“Ger dê te meqsûdek hebî,
lazim divê lê bî bi lez
Xesma te me'bûdek hebî,
daîm di emrê wî bibez”



Samî Hêzil

# Helbesta serkêş & romana barkêş

Helbest û Roman, wek du birayên hesûd in li mala wêjeya nûjen çarmêrkî rûniştine û ne yên çûyînê ne. Roman giran dimeşe û hêdî hêdî diaxive, helbest çapik e, destsivik e û direqise. Roman behsa şerekî dike lê helbestvan şerker bi xwe ye. Roman diltengiya evîndar pênase dike, helbest, wek gotina Mela teşbîhê zulfê dilberê biêşan e. Roman xwarin e, helbest pêxwarin e.

Romana çilek, çavbirsî, peyvan li ser hev diqurtîne, hevokan dihêre û xwînerê xwe dikişîne nav gêreseya paragrafan û wî/ê di zikê nehengê de bê serşûn winda dike. Her çiqas li hember xwînerên xwe bêinsaf be jî, azadiya lehengê xwe jî ji bîr nake roman. Tolkien vê manîfestoyê bi devê Gandalf aşkera dike: "Di nav serên we de mejî hene. Di nav pêlavên we de pê hene. Hûn dikarin rêça xwe kifş bikin. Hûn bi serê xwe ne. Hûn in yên ku biryara xwe ya cihê çûyînê bidin."

Helbest demdemkî ye. Geh diltenik û nazik e, geh dînik e, li çolê dikeve û suwarê xwe deverû davêje erdê. Caran sermest û romantîk e, carinan tûra dibe û heroîk e. Ne wek romanê tiral e, li cihê xwe nasitire. Hildipeke, peyv bi peyv diqele, qelîneka ser sêlê ye.

Rêya gelekan destpêkê li helbestê dikeve. Wek rêya kurt e, lê di rastiyê de çiqas kurt be ewqas jî dirêj e. Namzetê/a nivîskariyê di parsa xwe ya di binhişê xwe de gava piyê wî/ê li hêmayekê diale berê xwe dide warê helbestê. Helbet bi du bêjeyan helbestek çak nabe! Lê xem nake, çawa be embara klîşeyan tijî ye. Û çi tişt bi qasî du risteyên lihevhatî kelecanê nade mirov. Di ser de jî, ji kêm rûpelan pirtûkek saz dibe.

Ji wan şaşwazên rêka kurt yek jî Faulkner e. Xweş li xwe mukir tê her ku wek romanûs serpêhatiya xwe dide dest: "Ez bi xwe helbestnûsekî binketî me. Belkû hemû romanûs destpêkê dixwazin helbestan binivîsin, dema dibînin ku pêk naynin, berê wan dikeve çîrokê û dema di wê de jî têk çûn axiriyê romanan dinivîsin."


Vêca em jî yên ku destê wan jî nivîsandina her duyan jî nabe re çi bibêjin! "Di navbera nivîsandina romanên xwe de min helbest nivîsandin, ji bo ku ez têkçûna romanên xwe ji bîr bikim," wisa dibêje Philip Shultz. Lê mirov nizane bi vê gotina wî li ber helbestê aciz be an jî şerma romanê bike.

Her çi be û çawa be, roman û helbest cihê ku nêzik dibin ji hev dûr dikevin, li tanga dûr jî nêzikî hev dibin. Ew mîna her du hinarikên sûretê me ne, li rast û çepê me ne jî. Şal û şapikên me yên lihevhatî ne, lê goreyên me yên şarî û barî ne jî. Gelo bi qasî vê gotina April Bernard mirov dikare vê yekê wisa servekirî bibêje: "Roman derevînê di hundirê min de azad dike, helbest jî rastgoyê di hundirê min de dixe nav kemînê."

Gelo em kurd bêtir nêzîkî camêriya helbestê ne -camêr, lê camêrê dînomîno- an jî em wek romana sik û sar di cihê xwe de qerimîne. Rast e, em wek vebêjê romanê xeber-req in, rasterast dibêjin. Lê wek helbestvan peyvan li hev tînin, dixemilînin jî. Dema em paşûpê li dîroka wêjeya xwe dinêrin, helbest e ya ku serpêhatiya me ya qedîm dibêje, behsa helboqeyên ku li stûyên bapîran şidiyane dike. Pesnê egîtan egîtane dide û mixenetan rûreş dike. Ew e ya ku xemla çiyayên me çêdike, bi ava robarên me re av û av diherike bi qaydê Feqî, û li pirêzeyên welatê me bêhna xwe vedide. Lê roman jî ne biyanî ye êdî, zavê nav malê ye. Bi çîrokên xwe yên ecnebî hatiye li nav me û çîrokên malê jî lê zêde kirine. Xwînşirîn e, keç û xortên me lê baleçe bûne.

Wu Qiao, camêrê çînî gotinê xweş li hev tîne, her ku mînaka xwe li ser birincê dide: "Dema hûn pexşanê dinivîsin wê çaxê hûn birincê dikin xwarin, dema hûn helbestê dinivîsin jî hûn birincê dikin şerab. Birincê ku bûye xwarin şiklê xwe naguhere, lê birincê ku bûye şerab tişteke din e êdî. Birincê bûye xwarin zikê mirov têr dike, mirov pê dijî. Lê şerab jî mirov serxweş dike, kesên xemgîn şa dike û yên şabûyî jî xemgîn dike."

De îcar biryar ya we ye, hûn kîjan birincê dixwazin?



Ziman û Raman



Samî Tan

# Pergala rayekên lêkeran

Gelî xwînerên heftenameya Xwebûnê ev dem û hemû dem û çaxên we bi xêr û xweşî bin, stûşkestiya koronayê bi dîyarê we nekeve, Qesra Pêncgirik bi ber lehîya koronayê bikeve. Ev çend hefte ne, min ji ber vê rewşa awarte nekarî nivîsa xwe binivîsim, lewre kampûtera min dûredest bû, hê jî wisa ye, ez vê nivîsê jî li ser kompûtera nasekî dinivîsim.

Ev mijar li alîyekî, em niha werin ser mijara xwe ya têkildarî zimanê kurdî, xweşbextane saziyên me yên zimanî piştî koronayê jî karîn li ser înternetê kar û barên xwe bimeşînin, em hêvî dikin ev xebat geştir bibin. Her wekî hûn dizanin pest û pêkutiya li ser kurdan, bi xwe ra xerabûna bazara weşangeriya kurd anîbû, li belê Xwedê deriyekî digire, deh deriyan vedike. Piştî rewşa awarte ya li dûv derbeya beravêtî, deriyê bazirganîya pirtûkan a li ser înternetê li ber kurdan vebû, ew jî tiştekî ji xêrê rabû. Ez hêvî dikim ev rewşa awarte bibe sedem ku perwerdeya kurdî ya online bi pêş bikeve û em karibin qeyd û bendên dagirkeran bişikênin û sînoran dabezînin.

Di vê gotara xwe da min divê ez qala hin taybetîyên lêkeran bikim. Em di xebatên xwe yên rêzimanî da her tim lêkeran li ser bingeh û hîmê raderê ve diçirînin û dinirxînin. Dema ku em wisa dikin jî bivê nevê em pêşî rayeka demaborî ya lêkerê bi dest dixin û piştre jî xwe digihînin rayeka dema niha. Em vê yekê bi çend mînakan zelal bikin:

| | |
|---|---|
| *kirin> kir> k* | *avêtin>avêt>avêj* |
| *birin> bir> b* | *bûn>bû> b* |

Lê ev rêbaz di hin lêkeran da bikêrî me nayê. Em dişên ji bo vê rewşê jî çend mînakan bidin:

| | | |
|---|---|---|
| *kirîn> kir>kir î* | *birîn> bir>bir î* | *dirîn>dir>dir î* |
| *livîn> liv>liv î* | *revîn>rev>rev î* | *zirîn>zir>zir î* |
| *kenîn>ken>ken î* | | |

Her wekî ji mînakan jî xuya dibe, pêşî rayeka dema niha xwe nîşan dide, piştre rayeka dema borî bi dest dikeve. Îcar em vê morfema /-î/ wekî paşgireke lêkersaz bi nav dikin, ev yek bi mînakan jî tê peyitandin. Bi awayekî gelemperî ev paşgira /-î/ ji bo lêkerên têneper (negerguhêz) pêk tîne, lêbelê her wekî bala we jî dikişîne, hinek mînakên li jor (kirîn, birîn) gerguhêz in. Rayeka dema niha ya van lêkeran jî (rev, liv, zir) navdêr in, hinek jî (dir) rengdêr in. Heke mirov ji alîyê dîakronîk ve lê binêre, dibe ku ev paşgira me ne /-î/, lê /-ît/ be. Hinek lêkerên li jor bi vî rengî jî tên bikaranîn.

| | | |
|---|---|---|
| *kirîtin>kirît> kir* | *firîtin>firît>fir* | *kenîtin>kenît>ken* |

Her wiha di farisî da jî paşgira ku beramberî wê tê, /-îd/ e, her wekî “xendîden >xendîd>xend”. Heke bi vî çavî li mijarê binêrin, em ê bibînin ku paşgira me ya lêkersaz /-ît/ kurt bûye û îro êdî wekî /-î/ maye. Ev yek jî pergalê xera dike. Helbet ev mijar divê bi kûrahî û berfirehî bibe qada lêhûrbûn û vekolanê.

[1]*kenîtin>kenît>ken*

# Vîrusdewlet û korona

Çawa di dema êrîşên vîrusdewletê de me kurdan got; 'kesê mino destê mino' divê îro bêyî tu hêviyan ji kesî bikin, li hemberî vîruskoronayê li ber xwe bidin û bi ser bikevin. Berxwedana li hemberî vîruskoronayê li gorî ya vîrusdewletê pir hêsan e

Hisên Çatikkaş

Di vê nivîsê de em ê li ser du cureyên vîrusê bisekinin. A ewilî, îro li seranserê cîhanê belav bûye ku bi navê xwe yê tê nasîn coronavirus e, lê em ê jê re bêjin vîruskorona. Ya duyemîn jî li seranserê Kurdistanê belav bûye ku bi navê xwe yê tê nasîn dewlet e, lê em ê jê re bêjin vîrusdewlet. Her du cureyên vîrusê ji kuştina mirovan hez dikin ango her du jî ji bo mirovan bikujin li van deran belav bûne. Piştî belavbûna van her du vîrusan xwe-parastin kete rojeva mirovan û mirov ji bo xwe ji van her du vîrusan biparêzin berxwedaneke mezin dan û didin jî.

Vîruskorona li bajarekî Çînê derket û îro seranserê cîhanê belav bûye. Vîruskoronayê pergala kapîtalîst serobino kir û jiyana vê pergalê daye rawestandin. Pergala kapîtalîst a vê sedsalê ku xwîna mirovahiyê dimêht niha vîruskoronayê jiyan lê teng kiriye. Nîşaneyên pergala kapîtalîst bi hatina vîruskoronayê re rawestiyan. Buhayê petrolê ket, turîzm rawestiya, balafir weke berê nafirin, maxazayên mezin ên danûstandinê derabên xwe anîn xwarê, borseyên dewletan serobino bûn, febrîqeyan karên xwe rawestandin, çûnûhatina mirovan sekinî û elimandinên mirovan guherîn. Werhasil aborî û jiyana pergala kapîtalîst tengijiye. Tevî van hemû tiştan jî zanyariyên vê pergalê têra pêşîlêgirtina vîruskoronayê nakin. Ji ber vê yekê jî dewletên vê pergalê seranserê welatên xwe derketina derve qedexe dikin. Ev pergala ku bi çekên xwe yên nûkleerî û zanyariyên xwe pesin dida îro xwe li ber vîruskoronayekê nagire. Di sedsala 21'an de behsa destşûştina mirovan dike, berê mirovan didin malan û dibêje ji malên xwe dernekevin. Êdî cîhan ji ber vîruskoronayê bûye girtîgeheke mezin. Vîruskoronayê tirseke mezin kiriye nav dilê pergala kapîtalîst û bi vê ve girêdayî kiriye nav mirovahiyê jî. Vîruskorana belayek e ku ti ferqê nake nav mirovan û kî bike ber xwe nav guhan dide. Mirovên feqîr, dewlemend, navdar, qral, papaz û mela kî bikeve ber bi wan vedide. Tişta xuya dike, ev ê heta demekê bi vî awayî bidome. A ku pêşengên pergala kapîtalîst ditirsîne jî ev tişt e. Ew ji xwe ditirsin naxwe derdê wan ne mirovahî ye. Ma ne ew in ku şerên li cîhanê gur dikin û çek û cepilxanên xwe bi van şeran difiroşin. Her roj bi sedan mirovan di van şeran de didin kuştin. Bi kurt û kurmancî vîrsskoronayê bela xwe bi vê pergalê daye û nediyar e, ka dê kengî bela xwe jê veke.

Piştî şoreşa Franseyê netewdewlet derketin û li seranserê cîhanê belav bûn. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn netewe-dewleta tirk hat avakirin. Bakurê Kurdistanê jî bû mêtingeha netewe-dewleta tirk. Ji vê rojê şûnde netewe-dewleta tirk li xwîna kurdan dimije. Lê ji ber ku mijara me ne ev e, em ê ewqasî dûr neçin, tenê behsa çar sal berê bikin. Vîruskorona ya me li jor behs kir, bîra min kola û ez birim çar sal beriya niha. Çar sal berê ev nediyarbûn di serê me re derbas bûbû. Ev rewşa awarte ku vîruskoronayê li seranserê cîhanê belav kir, beriya çar salan li welatê min li çend bajaran hebû. Çar sal berê gelek bajarên Kurdistanê bûbûn girtîgehên mezin ku derketina kolanan li wan deran qedexe bû. Ev tiştên ku îro li seranserê cîhanê pêk tên, çar sal berê li çend bajaran pêk dihat. Ev nediyarbûna îro li tevahiya cîhanê belav bûyî, çar sal berê li Cizîr, Şirnex, Hezex, Silopiya, Sûr, Farqîn, Kerboran, Nisêbîn, Licê û Dêrikê hebû. Ev vîrusa ku jiyan li cîhanê tevizandiye, çar sal berê vîrusdewletê li çend bajarên Kurdistanê jiyan tevizandibû. Vîrusdewletê, her tişt li van bajaran sekinandibû; derabên dikanan anîbû xwarê, çûnûhatina mirovan a li van bajaran rawestandibû, av li ser van bajaran birîbû, elektrîk û înternet li van bajaran qut kiribû û derketina kolanan qedexe kiribû. Tevî van hemû tiştan jî kî û çi diket ber dikuşt bi tank, top, balafir û çekên gemarî yên vê pergala kapîtalîst. Wê demê kesî haj me nebû û kes li ser me nedigirî. Lê tevî hemû êrîşên vîrusdewletê jî li van bajaran berxwedana ciwanan û civaka kurd hebû. Werhasil îro ji vîruskoronayê xweparastin esas e, çar sal berê jî ji vîrusdewletê parastina civakê esas bû.

Heke em li ser ferqa di navbera vîruskoronayê û vîrusdewletê de bisekinin kula dilê me dê baştir bê fêhmkirin. Vîruskorona weke vîrusdewletê ne çavsor e û di derbekê de kesî nakuje. Ferqê dixe nav mirovan û piranî mirovên temenmezin dikuje, lê vîrusdewlet kî bikeve ber efû nake; pitik, zarok, ciwan, jin, pîr û kal yekûderb dikuje. Vîrusdewlet bi zanebûn dikuje. Ango vîrusdewlet xwedî hiş e, lê vîruskorona bêhiş e. Vîruskorona weke gurê bikeve nav keriyê mîhan çi bikeve ber gez dike lê hemûyan nakuje, lê vîrusdewlet çi/kî bikeve ber bi tank, top û çekên xwe yên gemarî dikuje. Di eslê xwe de her du jî vîrus in, her du jî kujer in. Her du dijminên mirovan e. Her du jî ji bo bikujin, hene. Yek hemû kesî yekûderb dikuje, ya din jî hinek kesan hêdî hêdî dikuje. Ji ber vê yekê ferqên di navbera wan de tenê ji aliyê rêbazan ve hene.

Vîrusdewletê çar sal berê rûyê xwe yê gemarî nîşanî me da. Me gelek tecrûbe jê girtin. Divê îro van tecrûbeyan li hemberî her du cureyên vîrusê bi kar bînin. Xwe ji van her du vîrusan biparêzin heta ev bahoz di ser me re derbas dibe. Belê çar sal berê vîrusdewletê em ji malên me derdixistin, em birçî dihiştin, depoyên ava me diteqandin, bi tank û topên xwe guhên me ker dikirin û derketina me ya derve sedema kuştina me bû. Êrîşên vîrusdewletê deh qatî li yê vîruskoronayê bûn. Tevî hemû êrîşên vîrusdewletê me li ber xwe da û em bi ser ketin. Ji ber vê yekê jî em dikarin xwe ji vîruskoronayê jî biparêzin. Çawa di dema êrîşên vîrusdewletê de me kurdan got; 'kesê mino destê mino' divê îro bêyî tu hêviyan ji kesî bikin, li hemberî vîruskoronayê li ber xwe bidin û bi ser bikevin. Berxwedana li hemberî vîruskoronayê li gorî ya vîrusdewletê pir hêsan e. Di dema êrîşên vîrusdewletê de bêelektrîk, bêînternet, bêtelevîzyon û bi xwarin û vexwarinên hindik çawa 2-3 mehan me karî bimînin li malên xwe û qet dernekevin. Niha jî gerek em karibin ji malên xwe dernekevin, li malên xwe rûnin û xwe ji vîrusan biparêzin. Bila mezin weke van rojên berê rûnin cem zarokên xwe û ji wan re çîrok, çîvanok, metelok, mamik û destanên dîroka xwe bêjin. Wê demê dê roj zûtir derbas bibin.



Xweşkanî



Felemez Ulug

## Civak bi tenê tê hiştin

Cîhana me di rojên pir zehmet re derbas dibe. Erka her desthilatdariyê û hemwelatî ew e ku, di van rojên teng de bi hev re bibe alîkar. Lê mixabin hêzên desthilatdar mîna her carê pêdivî û daxwazên gel danîne milekî û li pey berjewendiyên xwe ketine. Desthilatdariya AKP û MHP jî di van rojên reş û tarî de daxwazên gel ji neditînê ve tê.

Ji ber vîrusa koronayê li hemû cîhanê tengasî ango krîzek heye. Di vê krîza heyî de welatên daxwaz û hewildanên wan berjewendî û tendûristiya civakê bûye heya redeyekê li himberî vê vîrusê serkeftinên pozitîf bi dest xistine. Lê desthilatdariyên vê rewşa xerab jineditî ve tên ji hene. Daxwaz û armanca van desthilatdariyan jî ew e ku di vê rewşa wisa kambax de civakê bi her awayî muhtacî xwe bikin û xwe wek hêz bidin nîşandan. Niha li Tirkiyê tişta desthilatdariya AKP û MHP dike ev e.

Hemû kesên bi rewşa dewleta tirk dizanin ango dişopînin di ferqa lîstik û xapandinên desthilatdariya Erdogan de ne. Di vê rewşa wisa xeter û xirab de jî desthilatdariya AKP û MHP cudakariyê dixe nav civakê û civakê parçe dike. Desthilatdariya xema wê aramî û xweşiya civakê be wê bi tu awayî destûr nede lîstik û komployên bi vî rengî. Lê mixabin desthilatdariya Erdogan ji roja destpêkê ve li pey berjewendiyên xwe ketiye û di van rojên wisa teng de êşên civakê jineditînî ve tê.

Erdogan di van rojên ji bo civakê pir zehmet in de jî bi derfetên dewletê propagandaya xwe dike. Li ser her pêdiviyên ku pêwîst e di van rojên wisa zehmet de ji hêla saziyên dewletê ve li civakê bên belavkirin jî logoya serokkomarê tirk heye. Bi awayekî herî hêsan mirov dikare di vê nêzîkatiyê de kesayeta Erdogan ya takekesî bibîne.

Em hemû dizanin ku rewşa dewleta tirk a aborî zêde ne baş e. Ger di vê rewşa aloz de tedbîrên baş neyên girtin wê ev rewş hîn xirabtir jî bibe. Lê mixabin di vê rewşa xeter de jî desthilatdariya AKP û MHP li pey berjewendiyên xwe ketiye û guh nade hesasiyetên civakê. Di van rojên karantînayê de ger dewlet ji bo civakê foneke hêja veneqetîne wê gelek tengasiyên civakî yên pir mezin derkevin.

Bêguman desthilatdariya AKP û MHP her tim bi awayekî pozitîf nêzî alîgirên xwe dibe û beşên civakê yên din jî ji neditînî ve tê. Ev her tim wisa bûye. Di belavkariya alîkariyan de jî ev rastî derdikeve holê. Yanî mirov dikare bêje desthilatdariya dewleta tirk beşeke civakê ji xwe nabîne. Ev nêzîkatî bi her awayî înkarkirina hebûna mirovan e. Li Tirkiyeyê hêzek derfetên dewletê li gor berjewendiyên xwe bi kar tîne. Ev hêz rexneya ranake, ev hêz guh nade tu kesî, ev hêz amade ye ji bo berjewendiyên xwe hemû dewlemendiyên welat tune û zuha bike.

Rast e rewş pir xirab e. Em hemû di rojên pir zehmet re derbas dibin. Di van rojên wisa de ya herî girîng ew e ku mirov bi hev re bibe alîkar. Destê xwe bide hev û bi hev bawer be. Di rojên derbasbûn de me hemûyan dît ku tu plan û projeyên desthilatdariya AKP û MHP ji bo van rojên wisa teng û bieş nîn e. Lewma hemû hewildana wan ew e ku bikaribin xwe û hevalbendên xwe biparêzin hemû derfetên dewletê seferber dikin. Lewma em dibêjin desthilatdariya berjewendiyên civakê neparêze û nekeve bin xizmeta civakê her tim mahkûmî wendakirinê ye.

# Ne cudakarî xizmet hewce ye

Navenda Nûçeyan

**Ligel belavbûna vîrusê daneyên rast ji welatiyan tên veşartin û her wiha hikûmet nêzikatiyeke her tiştî di bin kontrolê de ye nîşan dide. Ligel rewşeke wiha jî îktîdar aşkera di xizmetan de cudakariyê dike**



Wekî hefteyên borî vê heftê jî mijara me ya sereke vîrusa koronayê ye. Tirkiye di serî de wekî welatên din ji dûr ve pêvajo şopand. Ligel Amerîka, Îngilîstan, Îtalya, Îspanya û Fransayê li ber çavan bû jî, tedbîrên pêwîst nehatin girtin. Cara yekem di 11'ê adarê de wezareta tenduristiyê daxuyaniyek fermî da û diyar kir ku hewceyî bi tirs û fikaran nîne, tenê li paqijiyê baldar bin, xwe îzole bikin û ji temasa nêz dûr bikevin!

Rayedarên hikûmetê êdî her roj bilançoya rojane, pakêtên aboriyê û biryarên li dijî belavbûna vîrusê hatine girtin ji raya giştî re aşkera dikin. Di serî de heta niha rayedarên dewletê li ser hev bangewaziyên 'li malên xwe bimînin' dikin. Bi hinceta ku hîn kargehên qelebalix dibin sedema belabûna vîrûsê hatin girtin. Derketina dervê ya kesên temen mezin hat qedekirin. Her roja ku vîrus belav dibû cureyên tedbîran hatin guhertin. Di 7'ê nîsanê de li 30 bajarên mezin qedexeya ketin û derketina ji bajêr hat destpêkirin, her wiha derketina derve ya kesên 20 salî hat qedexekirin, kontrolkirina trafîkê jî derxistin asta herî jor. Bikaranîna maske û lepik jî hat mecbûrîkirin. Hikûmet ligel hişyarî û aşkerakirina pakêtan jî banga bikaranîna kolonyayê kir û daxwaz kir ku welatî duayan bikin..!

**Dewletê alîkarî xwest**

Dewlet di çarçoveya tedbîran de bi taybetî bangewaziya 'Li malên xwe bimînin' û 'Jiyan li malê ye' dikin. Ev bangewazî her roj bi rêya medyaya alîgir ji hêla kesên alîgirê hikûmetê û kesên ku bi saya hikûmetê dewlemend bûne ve tên kirin. Lê ji ber berjewendiyên dewletê û newekheviya aboriyê ya di navbera welatiyan de niha bi milyonan welatî ji neçarî li derve bê parastin dixebitin. Her wiha bi milyonan welatî jî li gorî derfetên xwe yên kêm li malê ne. Li malê fikara dayina fatoreyan û li derve jî tirsa vîrusê heye. Hikûmet bangewaziya xwe kir lê belê tedbîr negirt û şert û mercên welatiyên xwe sererast nekirin. Hikûmet bi hinceta di nav dewletê de dewletek nabe dest danî ser alîkariyên ku ji hêla şaredarî, partî û sazî û dezgehên sivîl ve hatî komkirin. Piştre jî li şûna alîkariyê bide welatiyên xwe kampanyaya bi navê 'Kampanyaya Piştevaniya Millî' da destpêkirin û ji welatiyan alîkarî xwest.

**Pakêt ji bo sermayedaran bû**

Çend sal in li Tirkiyeyê krîzeke aboriyê heye û ev krîz her ku diçû bandorê li civakê dikir. Lê belê piştî belavbûna vîrusê krîza aboriyê bêtir li pêş ket. Ji ber girtina kargeh û fabrîqeyan hejmara betalan zêde bû. Deriyên sînor hatin girtin, hawirde û hinardekirin kêm bû û ev tişt bi tevahî bandorê li bilindbûna enflasyonê jî kir. Niha deynê Tirkiyeyê hem li hundir û hem jî li derve qat bi qat zêde bû. Serokomar Tayyîp Erdogan demên borî pakêta "Mertalê Îstîkrara Aborî" aşkera kiribû û li gorî pakêtê deynê şîrketên mezin ên sîgorta, pirîm û bankeyan hatin taloqkirin û her wiha deynên faîzan jî hatin daxistin. Lê ji pakêtê tenê şîrket û sermayedarên mezin sûdê girtin, lê kargeh û esnafên biçûk jî di halê xwe de man.

**Dê rojê 39 TL bê dayîn**

Ligel pakêta ku ji bo sermayedar û dewlemandan hat aşkerakirin, ji bo karkeran jî pêşnûmeyek hat amadekirin. Dûrxistina ji kar heta 3 mehan hat qedexekirin û lê belê mafê karsazan heye ku destûra bê pere bide karkeran. Her wiha dê ji bo karkerên ku ji kar hatine derxistin dê rojê 39 TL bê dayîn. Li vir jî heman tablo derket karsaz hatin parastin û karker, kedkar û xebatkar dîsa kirin qurbana pêvajoyê. Sendîka û dezgehên karker û kedkaran bertek nîşanî pakêtên aboriyê dan û gotin ev paket feydeyê nade welatiyan û bêtir xizaniyê kûr dike.

**Kedkar nayên parastin**

Li gorî daxuyaniya Meclîsa Tenduristiyê ya Karkeran û Ewlekariya Kar (ÎSÎG), li dijî koronayê heta niha ji bo 20 milyon karker û malbatên wan tu tedbîr nehatine girtin; gelek karker bê heq ji kar hatin derxistin an jî bê perê derxistin destûra salane. Li gorî daneyên ÎSÎG'ê di meha adarê de 14 karker ji ber vîrusa koronayê jiyana xwe ji dest daye. Bi girtina cihên komî, kafe, qehwexane, restorant, berber, kuafor, eywaneyên înternetê, maxaze û hwd, bi hezaran welatî jî bê kar man. Piraniya kesên ku li vir dixebitin debara mala xwe dikirin. Bi vî rengî li Tirkiyeyê hejmara betalan derket asta herî jor. Li gor Saziya Statîkê ya Tirkiyeyê (TUÎK) ji ber betaliyê niha 21 milyon dosye ketine ber îcrayê, ji du kesan kesek deyndarê bankeyane.

**21 jin hatin kuştin**

Bi belavbûna vîrusê re şîdeta li hemberî jinê jî her ku çû zêdetir bû. Bi taybetî bangewaziyên 'Li malên xwe bimînin' re rê li ber kuştin û şîdeta li hemberî jinê vekir. Berê jî jin nedihatin parastin, lê niha jin bêtir bê parastin man. Li gorî daneyên meha adarê 21 jin hatin kuştin. 18 jin jî bi taybetî li malên xwe hatine kuştin. Sazî û dezgehên sivîl ên jinan li gorî derfetên xwe alîkariyê didin jinan û bangên hişyariyê dikin.

**Ne cudakarî xizmet**

Qada tenduristiyê qada herî bi rîsk e û her roj bi nexweşiyê re rûbirû dimînin. Heta niha îro jî şert û mercên xebatê nehatin sererastkirin û kêmasiya amûrên tenduristiyê nehatin temamkirin. Ligel her tiştî gelek xebatkarên tenduristiyê yên ku bi Biryarnameya di Hukmê Qanûnê de (KHK) hatin îxrackirin daxwaza vegera kar kirin, lê daxwaz bê encam man.

**Li herêmê bîlanço ne zelal e**

Lê belê tablo li bakurê Kurdistanê ne zelal e û parvekirina daneyên li herêmê rê li ber fikaran vedike. Partiyên siyasî, sazî û rêxistinên sivîl çend kiryarên sazî û dezgehên dewletê rexne kirin, alternatîfên çareseriyê raxistin ber çavan û xebatên hevpar dan meşandin. Li gorî derfetên xwe li kolan, gund, bajarok, navçe û bajaran dest bi xebatên hişyariyê kirin. Der barê xebat û hişyariyan de lêpirsîn hatin destpêkirin. Her wiha Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) û Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) bi kampanyaya "Malbatên Xwişk û Bira" xwest alîkariyê bide welatiyan. Her wiha dînamîkên civakê li dijî xizmetên cudakar, xizmeteke hevpar dimeşînin.



---



Dîlan Aydin

# Şoreşger in ew!

Hefteya borî bi sernavê "kî ne û çi ne?" min xwest balê bikişînim ser zindaniyên ku bi dehan salan e di qefesan de, di dojehên vê cîhanê de bi bedelên gelek giran ên 'nedîtî' dijîn. Kesek dema ku ji salek heta deh salan di zindanê de bimîne, ji aliyê madî û menawî ve dê pir guherînên neyînî di jiyana wî/ê bi xwe de yan jî ya malbatê de çênebin. Lê ger ji deh salan zêdetir, ber bi bîst û sih salan ve biçe; ku ev dibe çaryeka sedsalê û ev salên dirêj bi xwe re gelek rewşên neyînî tînin. Ev hejmar, êdî hem ji bo girtî, hem jî bo malbatê dibe xala dawî, sebra dawî! Dibe mijara civakî lewre ew kes; ne ji bo xwe û malbata xwe, ji bo civaka xwe di wê rewşê de ne loma jî divê ku civak, bi sazî û siyaseta xwe bi aqil û wijdan nêzî 'wan kesan' bibe.

Çi mijar dibe bila bibe, hin rewş hene heta tu bi xwe nejî, nikaribî empatî bikî yan jî his nekî nikarî mafên wan bidî. Her yek ji me bi xwezayî xwe berpirsyarê/a hinek tiştan dibîne ku ev yek hem xwezayî ye, hem jî îradeya me diyar dike. Bifikirin; ger dema em sibehê ji xew rabin, tu tiştek nekin, hema wisa bi halê tevizandî li cihê xwe rûnên dê rewşa me, mekanê me, derdora me, gund û bajarê me çawa bibe? Ya girîng jî dê bedena me moral û motîvasyona me bi çi rengî bin?

Gelek pirsên wiha divê em ji xwe bikin, yan na em ê nikaribin 'xwe' bibînin, dema em xwe nebînin em ê hev jî nebînin. Dema em xwe nebînin, em ê çi bin, çawa bin? Xwenedîtin koritî û kerîtî (nebihîstin) nîn e gelo? Dema ku em hev nebînin, jiyan, têkilî, kar û barên me dê çawa pêk werin?

Niha pirsgirêka esasî ya ji bo me ew e ku em 'xwe' bibînin, ji xwe dest pê bikin. Ger em ji xwe dest pê nekin dê çavên me her tim li derdora me be, em ê ji neçarî hewl bidin xwe 'wekî din' nîşan bidin, xwe bişibînin 'kesên din' ku ev yek teqlîd bi xwe ye heta em dikarin bibêjin ku ev nahêle em dirust bin, dibe sedem ku em ji xwe birevin... Encam; xwenenasî, bêbaweriya ji xwe, girîngînedayîna xwe, seranserî û valahî... Pêşiyên me gotine; "Çavên li deriyan, xwelî li seriyan" ev ne tenê ji bo rewşên madî hatiye gotin, ji bo mijara me jî derbasdar e lewre divê em aqil, wijdan, raman û hestên xwe bizanibin, nas bikin û ji bo bi kêrî tiştek werin bixebitînin.

Em kes û civak awêne ne ji bo hev lê divê em vê yekê veneguherînin ezber û teqlîdê. Hêza her yekê ji me hêza hev, bêhêziya her yekê ji me jî bêhêziya hev e lê divê em vê veneguherînin çavnebarî û pêşbaziyê! Em xwerû, dirust, ne li gorî pergala ku her tişt îmal kiriye; li gorî çanda xwe ya sedan salan, çanda xwezayî bijîn bi baştir û hêsantir nîn e gelo?

Helbestvanê îranî Şemsê Tebrîzî dema ku bi mûman li kolanan geriyaye jê pirsîne tu li çi digerî? Wî ev bersiv daye; "Ez li însanan digerim." Tebrîzî 800 sal berê wiha gotiye, îcar em ên di vê serdema ku her tişt lê serûbin bûye, ji hev parçe bûye, gelek tişt tenê bi nav mane lê wateya xwe winda kirine dijîn, em ê bi çi û çawa li xwe bigerin? Bi kîjan gotin û karî, bikaribin mafên hinek mijaran bidin?

Dixwazim bi sernavî ve girêdayî, navek ji kesên ku nakevin kategoriya kesên daxwaza berdana wan tê kirin re bibînim da ku dema mijar bû berdana girtiyan, em bikaribin navê wan jî bê sansur û fikar bibêjin. Belê kî ne ew kesên ku di bihara temenê xwe de berê xwe dane nava şer, di demek kurt de hatine girtin û gelek ji wana ji ber parastina siyasî cezayê muebedê girtine? Ne bijîjk, akademîsyen, siyasetmedar, pêşengên gel û hwd. in. Şoreşger in ew! Serhildêrên dawiya sedsala 20'î ne, gelek tişt bi ked û bedela canê wan ê ciwan pêk hatine û ew kesên behsa wan tê kirin jî li ser ked û bedela wan çêbûne. Divê her kes vê rastiyê bizanibe, qe nebe tenê bi gotinê be jî; layiqê keda wan bimîne!

# Gundê Hemdûnayê

Ayhan Erkmen



Hemdûna; di welatê Xaldiyan de yek ji wan gundên herî kewnar e. Ji Êlihê pêncî û ji Qûbînê jî sî û du kîlometreyan dûr e. Di dema xwe ya biro biro de gund şên bûye. Lê mixabin roja îroyîn, di gund de bi tenê pênc malbat dijîn. Ew ji eşîra denayî ne; ji wan malbatan yek ji Şengalî ye. Ji feqîrî, zor, zext û zilmê êzdî ji cih û warên wan kirine. Ji bê hedûriyê ji welêt derketine, lê tirsa wan ew e ku li cihên hedûrî lê heye, civak ê ji çanda xwe dûr bikeve.

Di sedsala 19'an de Dewleta Osmaniyê bi şerên Rûsya û Îranê û di serhildanên Balkan û Misirê de şerpeze dibe û xwînê winda dike. Desthilatdariya wî ye li ser mîrektiyan jî sist dibe. Ji bo vê zexm bike Mistefa Reşît Paşa wek walî dişîne Amedê. Ev Reşît paşa li ser êzdî û ermenan komkujiyan pek tîne.

Serekê Xaldiyan Mîrzikê Zaza, ji ser vê zilm û zextê, ji serleşkerê rûsan ê Kafkasan, general Koms Paskêvîç re tekîliyan çêdike û dixwaze ku ji civaka xwe re rêyekê peyda bike. Jê re çend nameyan dişîne.

Di nameya xwe ya gulana 1830'yî de behsa razîbûna xwe ya hatina rûsan a Panosê dike. Name bi ermenîkî hatiye nivîsîn. 'Ji aliyê qûlê Xwedê, Mîrza axayê Ridwanê, gelek silav û kilavên dostaniyê ji leşkerê Îsayî altindar û xweşmêr, birêz Paskêvîç re …1500 siyar û 5000 hezar leşkerên min yên peya hene…wê salê dema leşkerên te ketine Panosê … ez bi welatê xwe; hemû xelqên êzdî û Xaçparêz bi hatina te pir kêfxweş bûn, 22 Gulana 1830'yan'. Heta di dawiya vê nameya xwe de ji ber ku çavê kurê wî kul bûye, ji bo çavê wî derman dixwaze.


Di navenda gundê Hemdûnayê de kaniyek bi kevirên zer û bi antîke hatiye çêkirin heye. Nivîsa li ser kaniyê balkêş e; 'Ev kanî ji bo bîranîna zanyarê îngilîz ê ku di sala 1849'an de gelê vî gundî zîyaret kiriye, Rêzdar Henry Layard hatiye çêkirin.'

Aûstîn Hênry Layard dîplomat û arkologekî îngilîz e. Di sala 1849'an da dema ku bi tevî komek zanyarên îngilîz ji bo lêkolînê tê herêmê, li gundê cîran Ridwanê giran nexweş dikeve. Hevalên wî hêviya xwe jê dibirin û diçin, lê hekîmên êzdiyan bi tecrûbe û dermanên xwe sê mehan wisa lê mêze dikin ku camêr silamet dibe. Dema vedigere Îngilîstanê bîranînên xwe yên der barê êzdiyan de wek pirtûk diweşîne. Ridwan wê gavê di destê malbata Mîrzikê Zaza de ye. Badoyê birê Mîrzik hemsalê Aûstîn e.

Ji nifşê çaremîn nebiyê Aûstîn, Johannês Dûchtîng di serê salên 1980'an de der barê gundê Ridwan û Hemdûnayê de, di rojnamekê de xeberekê dixwîne. Neheqiyek hatibûye serê êzdiyên li vê derê, dilê wî dişewite, 132 salan ji pey hatina kalikê xwe, tê gundê Ridwanê. Lê li wir êzdî nemabûne, ji wir jî tê gundê Hemdûnayê.

John Gest di salên 1987, 88 û 89'an de dîsa tê gundê Hemdûnayê. Wek kalikê xwe dibe mêvanê êzdiyan. Dixwaze ji bo xatirê kalikê xwe û nîşaneya minnetdariyê qenciyekê ji gund re bike. Dema ku pir israr dike gundî jî behsa pirsgirêka avê dikin û John bi perê xwe ji gundê cîran Beşpinarê avê tîne Hemdûnayê û kaniyê dide çêkirin. Ew jî wek kalikê xwe der barê êzdiyan de du pirtûkan diweşîne.

Li ba êzdiyan zewaca ji dervayî civaka êzdiyan qedexe ye. Ji ber wê ye ku ji Şengalê jî bûk tênê gundê Bişêriyê. Meta Sara jî bi salan berê ji Başûr bi zewacê hatibûye Hemdûnayê. Bêdengiya gund herî zêde bi jinan zor tê. Ji ber ku mêr carina diçin dervayî gund lê jin tim li gund in û di bêdengiyê de ne; bi xeyalên zar û zêç û cîranên koçber re dijîn û xweziliya xwe bi wextên berê dikin.



Aûstîn Hênry Layard

Ji Hemdûnayiyên li Evropayê dijîn, di van salên dawîn de, ji ber wasiyetên wan, miriyên xwe ji Evropayê tînin û li gund dispêrin axê. Di nav goristana gundê Hemdûnayê de ziyareta Xafûrê Rêyan heye. Bi heman navî ziyaret li başûr jî hene. Ev Ziyaret wek qubbekê û çar goşe hatiye çêkirin. Di demên berê de çûyîn û hatin pir zor û zehmet bûye. Bi Xefûrê rêyan, wek parastvanê rêyan hatiye bawerkirin û rêzgirtin. Dema ku hinek rêwî bin, malbat û heskiriyên wan dibêjin ku 'Xefûrê Rêyan, bi we re be, bi xêr û silametî herin û vegerin.' Ger ku hebe parî xweliya ziyareta Xefûrê Rêyan jî didin destê kesên rêwî, xwelî tune be jî ji pey rêwiyan av tê rijandin. Rêwî jî bi duaya;

*Banga min xwedê û Xefûrê rê ye*
*Riya heqî riya Xefûrê rê ye*
*Heke çiya ye û heke berî ye*
*Şêx Adî û Melek Şêxsinê Adiya*
*Em bi saxî û silametî ji van çiya biçine wan çiya.*

***Çavkanî;***
***Dîroka Êzdiyan: John S Guest***
***Ezîdiyatî, Mîrzikê Zaza, Fermanên Reş: Eskerê Boyik***
***Hin Gotarên Kemal Tolan û Orhan Basî***



# Vace-Bêje

Kenan Colemêrgî



Demek dirêj di navbeyna nivîsa yekem û vê nivîsa han de derbas bû. Ji ber vê yekê pêwistiya çend pênaseyên biçûk hene digel vê nivîsê.

Me di nivîsa din de xwest hinek qala dengî bikin, ka çawa deng bû amûrek veguhastinê û taybetiyên dengên xwezaya me çi bûn.

Hûn jî dizanin ku dengê vê erdnîgariyê bi rûpelek nivîsê naqede. Em behsa dengek 20 hezar salî dikin û ev behs pêdiviya zanistiyên cûr bi cûr heye ku mirov têbigehe ka ev amûra veguhastinê(deng) çawa ava bû û heta roja îro hat. Ji bo deng, hinek cerebeyên xweza û jiyanî pêwist in, piştî van hemû cerebeyan bi dengan bêje an ku peyv ava dibin, paşê ev hemû bi hevûdu ve dirisin û amûrek veguhastinê ava dikin. Li cem me ev amûr, dengbêj in û ji hêmanên deng û bêjeyê pêk tê. Digel van hêmanan bîrek berfireh jî heye helbet, bîra bûyeran, dengan, bêjeyan û girêdanên dîrokî. Ku ev amûra veguhastinê bikaribe van hêmanan pêk bîne, hewce bi şarezabûnekê heye, weke bênderekê van hêmanan têkil dike û yan formeke nû ava dike, an jî destanekê, çîrokekê, stranekê û hwd. ava dike. Jêhatinek wisa ye ku bi kontrolek bilind cureyên vokalê didomîne, digel vokalê, bi laş, deng û mijarên bihîstî ve bizarek bêhempa dike. Kesên ku lê dinêrin û lê guhdar dibin, dikevin nav mijarê û ew jî jêhatina xwe bi lêkanîn û fêmkirinê nîşan didin.

**Dengan bi bîra çiyayan bêje afirandin**

Demekê ji bo tomarkirina destanekê em çûne li cem dengbêjek Colemêrgê, em rûniştin û me pirsiyarên xwe kirin, dengbêj navberekê li gorî xwe nirxandinek kir, got ku; "Lawje hûn dizanin çi ye? Lawje, law-wêje, law-bêje, law-bêji ye." Li vir nirxandinek tijî tûrikê bîra hezar salan kiribû. Ew hem dengbêj, hem zimanzan, hem rûspî, hem zanayek bêhempa bû wê demê. Law, li cem colemêrgiyan ji tiştên rind re tê gotin, jixwe bêje jî tê wateya peyvê. Wateyek wiha ji peyva lawjeyê derdiket; 'rindgotin', tiştek bi xemla xwe ve gotin. Bi reseniya xwe de wisa bû, harmoniyek ava dibû û ji vî tiştê rind û xweş re digotin; lawje.

Bi demên dirêj ev di bîra min de xwe hilavêt û avêt. Heta rojekê rastî pîrejineka nanpêj hatim, li ser tenûra xwe qelûna xwe hilkirî, digel paleyên xwe yên nanpêj diaxivt. Heke kesek li van deran di pêşiya tenûrekê re derbas bibe divê para xwe ya nanê germ ji wê tenûrê bigire. Bêhnekê rûniştim û navberekê pîrejin, ji nanpêjek bêdeng û ponijayî re got; "heşko"avang"êt vê hatine!" dema wiha got, mûyên serê min qij bûn. Bêhna vê peyva resen û xav ji bêhna nanê tenûrê tûjtir hate kepê min. Min pirsyar kir; "Xalet, Avang çi ye?" Xalet keniya û got; "Ew deng û wehiya ku ji pêxemberan re tê, aha yên me jê re digotin Avang"

Wê pîrejinê, hem peyvek gelek nas hem jî peyvek gelek dûr û biyanî digot. Ev ji 'Veng'ê dihat, ew 'veng'a ku bi guherîna dengên 'v-d' bûye 'Deng'. Jinek colemêrgî hem peyvek gelek kevn bi kar tînand û hem jî bê haya xwe bi kirmanckî an ku bi zaravayê kurdî ya yekem bêjeyek bideng dixist. "Avang tê wateya "Wahî"yê, wahiya ku ji zimanê erebî belaveyê zimanên derdoran bûyî, ji "waḥy وحي" tê û li cem zimanê erebî wate dibe; "agahiya ku ji afirîneran tê, dengên ji mirov ava bibin." Li vir şiroveyek berfireh em dikarin li ser "Avang"ê bikin; Avang, tiştê ku ji veng-deng tê û vediguhêze gotinan an jî wekî din dengê ku êdî bibe "bêje". Wê pîrejinê raveya çend hezar salan digel nanpatina xwe kir. Veguhastin tiştek wiha bû, çandek tijî deng û çandek ji tijî dengan bêje, peyv...

Dengan bi bîra çiyayan bêje û peyv afirandin, peyvên têr û tijî, wisa ku di nav xwe de çand û dîroka cîhanê dihewîne.

**Deng û Bêje an jî Veng û Vaje Çawa Pêk Hatin?**

Hûn li çiya û zozanên Colemêrgê bigerin, dê bi hezaran wêneyên ser keviran bibînin; şikl û wêneyên pezên kovî, teyr, gurg û teşeyên nenas, teswîra mirovên nêçîrvan û hwd. Mirovan 10 hezar sal berî niha çîroka xwe, bûyerên bandorkirî, bawerî û jiyana xwe bi vî awayî xwestine veguhezînin nifşên piştî xwe. Em dizanin ku mirovahiyê xwe nas kiriye heta niha xwestiye cerebeyên xwe û jiyana xwe bi awayekî vebêjin û derbasî nifşeke din bikin. Şikil û teswîr sînordar bûn jî veguhazê re lê belê deng ne wisa bû. Bi avaya deng, dikarin bandora veguhastinê xurtir bikin, bi deng dikarîn pênaseyên berfirehtir û hevalnavên cûrbicûr biafirînin. Ji "Veng-Deng"ê "Vace-Bêje" afirandin û pêkanîn. Ev bi xwesteka mirovên çiyayî pêk hat, çandek wisa afirî ku bi hezar salan veguhezî, ev çand dengbêjî bûn.

Di vê sedsalê de mirov hêdî hêdî xwe wenda dike, hest û raman bi amûrên teknolojîk kêm dibin, jiyana hevpar û civiyanên germ cihê xwe ji takekesî û dûrmanê re dihêle. Heke tiştek hebe ku di vê demê de hevsengiyekê çêke ew jî ev bêje û deng in, ev çanda devkî ye. Dinya vê demê li dûv çanda devkî ye, gelek saziyên cîhanî, yek ji wan UNESCO êdî xebatên xwe zêdetir ji çanda devkî re lêkve dike, van mîrateyan digire di bin qeydê de û weke mirateyên cîhanî lê miqate dibe.

**Em di nav behra deng û bêjeyan de ne, mixabin ku melavaniyê nizanin**

Li Mezopotamyayê gelên jiyayî, digel xwe hevparî û guherînên cûrbicûr anîn, bi vê yekê re ziman, kiryar, formên muzîkalî û nirxên çandî bêtir zengîn bûn û bi pêş ketin. Pêşengiya vê pêşketin û zengînbûnê çand û muzîka kurdî dike.

Cîhan hê jî hay jî vê gencîneya kurdan nîne. Divêt kurd her cihê ku lê dijîn muzîk û çanda xwe ya devkî belge bikin, navendên dokumantasyon û arşîvên dengan ava bikin, bi pergaleke xurt divêt lêkolîn û xebatên xwe bidomînin, tomarkeriyê bidin hezkirin û piştgirtiyan bikin. Em niha li destpêka dawiyê ne. Peywira me hemûyan e ku muzîk û çanda kurdî bigehînin ber dinyayê, ber bîner û guhdarvanan; dîrok, wesf û çawaniya muzîka kurdî divêt baştir fêm bikin û van agahiyan divêt di qadên akademîk de belav bikin û biweşînin.

Divêt miqateyê deng û bêjeyên xwe, dengbêjên xwe û miqateyê ev çanda kûr û qahîm bibin. Belê em di nav behra deng û bêjeyan de ne, nizanin melavaniyê bikin lê belê ew behr bi herikîna xwe dê me her bi pêş bixe, ne tenê bo kurdan bo tevahiya cîhanê, hineke din melavanî, soberî hewce ye, bes hineke din...

Merdimîya Rîpêşine


# Antrparantez

Pêşar Bextewer

Êyê ke haya înan esta zanê, mi nê rojnameyî de nuşteyê xo yo yewin aşma verêne (hûmara 13.) de nuştbî. Yê wextan ma welatê xo û Tirkîya de ehemîyetê Covîd19î hema baş fehm nêkerdbî. Corona yan zî bi nameyê xo yê taybetî Covîd19 jano global o. Sey zafê welatan ma de zî her roj testê bi seyan kesan pozîtîf vejînê û heyf ke gelek kesî mirenê. (Goreyê beyanatê Wezaretê Weşîye yê K.T. roja ke mi no nuşte nuştênê 96 kesî wefat kerdê.) Seba ke no vîrus sîrayetê ma nêkero, yan zî ma ra sîrayetê kesî/e nêkero bêguman seke şima zî zanî ganî ma tedbîr bîgîrê. O tedbîr zî nînan ra îbaret o: Seke hertim yeno tekrarkerdiş ganî ma keyayanê xo de bimanê yanî xo îzole bikerê, kesî reyde temas nêkerê û mesafeyê xo yê sosyalî ronîme. Îcab nêkeno ke ez şima bi nê detayanê dîyaran eciz bikera.

Çîyo ke ez çend rojî yo ke ser o fikirîyena no yo: Na dinya xeyrcê tebîetî eserê merdiman a. Mefhûm û îcadê newe û musbetî pêro netîceya aqil, xebat û keda merdiman de vejîyê meydan. Yanî sayeyê merdimîye de estê. La merdimîye (însanîye) ewro bi rîpêşan (maskeyan) ciwîyêna. Ma no zî dî: Merdimîya Rîpêşine. Ya, her cayê dinya û her miletî ra qij û pîl, cinî û camêrd, ciwan û kal yanî heme ferdê famîlyaya merdimîye bê rîpêşan cif/solix nêdanê û nêgênê. Reyna dîyar bî ke ma merdimî wayîrê na dinya nîyê ma tena parçeyê sîstemê ekolojîkî yê. Heyf ke merdimîye dersan nêvejena… Xulasa seke baw û kalanê ma nêvatêne: Hela hona ma çi vînenê!

Mi va baw û kalê ma yewna vîrus ame mi vîrî. Vîruso ke serranê 1920î ra nata ma mîyan ra yeno vilakerdiş, ey ver ewro kirmanckî halê sekeratî/hema-hema ke mergî ver de ya. Madem ke şima keyeyanê xo de tena mendî ez vana tayê ney ser o zî bifikirê. Dima ra wendiş û nuştîşê kirmanckî bimusê. Eke şima zanê, o wext xo hîna aver bêrê. Bê naye ez rojanê îzolasyonê Covîd19î de şima rê filmanê Ingmar Bergman, T. Angelopoulos û Tony Gatlîfî pêşnîyaz kena. Ancîna eke şima hetanî nika ê nêwendê, Engişta Kejê ya Malmîsanijî, Beyi Se Bena yê Î. Esparî, Tarîyîya Adirî ya R. Lezgînî, Hîkayeyê Koyê Bîngolî û Kalaşnîkof yê D. Gunduzî û îllehîm zî Gorse ya J. Zengilanî biwanê.



Mi seba şima anektodêko balkêş û sosreto ke mabênê Î. Înonu û Churchîllî de qewimîyayo, açarna kirmanckî ser. Peynî de ez vana keremê xo rê muqayetê xo bibê. Û seke Baba Tahirê Hemedanîyî hezar serrî verê vato: Ezîzênê qiymetê yewbînan bizanê, çunke ecel yew kemer a ma zî yew cam.



**Serekwezîro îngiliz Churchîllî ra Îsmet Înonuyî rê dersa kurdkî**

(Sersefîr û Wezîrê karanê teberî yo kehen Numan Menemencîoglu vano)

"Churchîll û Roosveltî seba ke ma daxilê şerî bikê 1943yî venga min û Înonuyî da ke ma bêrê Qahîre. Nîyetê Înonuyî çin bî ke Tirkîya bikewo şer. Hem Adana de hem zî Qahîre de tezê ey wina bî: "Rewşa artêşa ma goreyê şerkewtişî nîyo. Techîzat bidê, artêşa ma bivejê sewîyeya artêşanê şima, a game hay hay ma bikewê şer! La ne Churchîll ne zî Roosveltî bawerîya xo bi tirkan nêardêne. Ma ke înan badê ke teçhîzat girewtî, derbazê terefê almanan bibê, do çi biameyêne kerdene? Labelê înan demêk waşt ke bi hedîseyêke winasîyî çimê ma bi meseleya kurdan bitersnê. Malum seba ke amebîy miletanê muslumanan mîyan, înan xo reyde gelek oryantalîstî ke her ziwan zanayêne ardbîy. Nîşka ra Churchîllî Înonuyî ra va ke:

-"Paşa, ti kurdkî zanî?"

Îsmet Paşa mat mendbî. Nêzanayêne ke do vajo çi? Hema ke ey çîyê nêva ez kewta mabên û mî dest de va:

"Ekselans, ma kurdkî nêzanê. Xora ma de bi kurdkî qisey nêbeno û ziwanêko winasî zî çin o."

Churchîllî merdimanê xo mîyan ra yewî ra pers kerd:

"Winî yo mîster, bi nameyê kurdkî ziwanêk çin o?"

Senî ke ey wina va, helbet mêrik verê ra amadebîyaye, ca de werişt payan ser û va;

-"Senî çin o ezbenî, yew zîwan û edebîyatê kurdkî yo dewlemend esto. Eke şima biwazê –ma heta o wext qet nêeşnawitbî- ez Dîwanê Cizîrî ra yew şîîre biwana."

Churchîllî "biwane" va. Mi fehm nêkerdêne la ey yew şîîra ke manayêne fariskî û zaf ahengine bîye wende. Û va ke na şîîre kurdkî ya.

Va "madem winî yo na şîîre binuse." Ey zî nuşte. Churchîllî va "naye biçarnên îngîlîzkî ser." Înan açarnaye. Va "yew zî biçarnên fransizkî ser." O zî kerd. Reyê zî açarnaye tirkî ser. Û mi ra va:

"Mosyo, hela ti zî bê! Seba ke nê hîrê ziwanan de eynî çî bero îfadekerdiş hewceyîya çend çekuyanê xerîban bîyo ke ê îlaweyê metnî bîyê?"

Metnê fransizkî de [çekuyê xerîbî] qet çîn bî. Yê îngîlîzkî de çend çekuyê ke kokê înan latînkî bî vejîyayî, eslê ey yê kurdkî de çar yan panc çekuyê erebkî ameyî dîyayene. La eke dore ameyê nusxaya tirkî ser, aye de "dır" û "ile"yî ra teber bi tirkî tu çî nêmendbî. Tayê çekuyê xo erebkî, tayê xo zî fariskî û ziwananê ewropayî yê cîya-cîyayan ra amebîy girewtiş. Churchîllî her çar rîpelî zî ma ver ronay û seke vajo "Ayb nîyo" ewnîya ma ra û va:

"Biewnên efendîyênê, şima dewlemendîya kurdkî ke zafaneya welatê şima de sey ziwanê dayîke yeno qiseykerdiş û şima va çin a dîye!"

Mi demeyêko derg wezîrîya karanê teberî kerde, la qet yewna rojê nêna mi vîrî ke ez hendayê a roje tengezar û şermezar bîya.

*(Neqilkerdox: Bi şahidîya Profosorê Huqûqê Üsulê Ceza yê Fakulteya Huqûqî yê Unîversîteya İstanbulî Tahîr Tanerî Musa Anter, Hatıralarım, r. 128-129)*

# Bi perwerdeyê dûrî ra kursê kirmanckî

Merkezê Xeberan

Nê rojanê Vîrusê Korona (Covid-19) ke pêroyê dinya girewto binê tesîrê xo de tayê aktîvîteyê ke derheqê dersanê kurdkî virazîyenî. Kesê ke biwazî nê rojanê ke keyeyanê xo de vîyarnenî dekerde derbaz bikerî, eşkenî ziwanê dayîka xo bimusî. Komeleya Cigêrayîşan ya Kurdan ya ke Stenbol de xebatan rayîr bena, kursê xo yê kirdkî (kirmanckî), kirdaskî (kurmanckî) û sorankî Vîrusê Korona ver betal kerdbî û nika înternetî ser ra bi hawayêkê onlineyî rê xo dewam kena. Hetê bînî ra mamostayê kirmanckî Mutlu Can xebatêk da destpêkerdene û çarçeweya na xebate de kesê ke biwazê kirmanckî bimusê, eşkenê bi perwerdeyê durî ra tewrê kursê kirmanckî yê Canî bibî û bi no hewa ziwanê dayika xo bimusî.

Dersê ke Canî do bido hewte de 1 roje û 2 yan 3 saetan ra awan bibo. Dersî do bi perwerdeyê dûrî ra û taybet bêrî dayene. Dersê kirmanckî sey komkî ney do şexsî bêrî dayene. Mamostayê kirmanckî Mutlu Canî qala dersan kerd û derheqê dersan û tewrbîyayîşê dersan de tay agahîyan da. Mamosta Mutlu Canî persanê ma ser o rojnameyê ma rê qisey kerd û tayê melumatî day.

**'Perwerdeyî ser o zî tesîr kerd'**

Canî destpêkê qiseykerdişê xo de bale ante tewrbîyayîşê kursanê kurdkî ser û wina va: "Îzolosyanê sosyalî ke badê Vîrusê Covîd19î her welatê dinya de sey vernîgirewtîşo sereke ame destpêkerdiş sey zafê waranê cuye, perwerdeyî ser o zî tesîr kerd. Heme dinya de bi perwerdeyê dûrî ra perwerde alternatîfo zarûrî û tekane vejîya vernî. Kurdî parçeyêkê merdimahî yê û naye ra girêdaye normal o ke perwerdeyê kurdkî (kurmanckî-kîrmanckî) zî êdî bi nê metodî bêrê kerdiş. Bi mi bin o hewa kursî do vera-vera hîna vêşî bibê"

**'Seba musayîşî alternatîfêk o'**

Canî qiseykerdişê xo wina domna: "Yew avantajo muhîm yê nê kursan zî no yo. Her bajar û her welatê dinya ra merdimî eşkêne beşdar bibê. Eke ma tayê cayan de çinbîyayîşê kursan yan zî dezgeyanê kurdan-kurdkî bîyarê xo vîrî ma faydeyê bi perwerdeyê dûrî ra hîna weş fehm bikê. Kurso ke ez organîze kena zî seba musayîşê kirmanckî alternatîfêk o. Taybetîya xo ya bingeyinê na ya ke ez do dersan xususen şexsan rê bida yanî yanî yew grûbe yan zî sinife rê ney. Naye ra girêdaye kontenjanê kursîyeran do zî sînorkerde bo. Bêguman amancê mino verên temînê ameyeyî (gelîr) nîyo. Aye ra heqê dersan do bi saetane û sewîyeya cûzî de bibo."

Canî tewr peynî de semedê musayîşê ziwanê dayîke veng da û da zanayene ke kesê ke biwazî ziwanê dayîka xo bimusî eşkenî ê reyde têkilî ronî û wina qedêna: "Ziwan ke nêbo manaya miletbîyayîş çi ya? Bê ziwan û kulturî welatperwerîye nêbena. Coka ganî kurdî ememîyet bidê musayîşê kurdkî û îmkanê perwerdeyê durî ra îstîfadê bikê."







# Ajokarê wesayîta cenazeyan

Mêrikek piştî ku 20 salan ajokariya wesayita cenazeyê kir, ji wî karî aciz bû û biryar da ku ji xwe re taksiyekê bikire û di nav bajêr de dest bi karê teksîcîtiyê bike. Mêrik ji xwe re erebeyek kirî û dest bi karê xwe kir. Roja pêşî ya kar bû, rêwiyekî destê xwe jê re hilda, mêrik li ber sekinî û rêwî siwar kir. Piştî ku cihê xwe jê re got û qederekê çûn. Gihan nêzî kolana mêrik, mêrik destê xwe ji paşve avête milê ajokar da ku bêje bi vir de bizîvire. Ajokar veceniqî û kete kelecaneke mezin ha vir de ha wir de dikir ku qezayeke mezin derbas bike, di kêlîka dawî de rawestiya û ji rêwî re got: "Ma mîrat te ziravê min qetand." Rêwî got: "Heyra min tiştek nekir tenê min destê xwe da milê te da ku bêjim bi vir de bizîvire."

**Ajokar got:** "Ya rast ne gunehê te ye bira, min 20 salan ajokariya wesayita cenazeyan kiriye. Lewre kesên li paş min herdem miriyek di tabûtê de bû. Loma tu caran kesekî/ê ji wan dest destê xwe ji paş de li milê min nedaye. Ji ber wiha ez tirsiyam û min got qey mirî ji tabûtê rabûye û destê xwe li milê min daye."



## XAÇEPIRS



### JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

3.Ne nêzîk 5.saziyeke navnetewî 7.Cureyeke gulan 8.Hejmarek 9.Navekî kuran 13.Henek 14.Belê 16.Cureyeke pereyan 19.Awa 20.Kurtasiya navê doktor 21.Kinceke dirêj 22.Çala avê 25.Ne tûj 26.Navê mehekê. 28.Raperîn

### JI JOR BER BI JÊR

1.Paşnavê helbestkarekî kurd yê Rojava 2.Awayeke pêşandana fîlman 3.Daçekek 4.Madeyeke sereke di çêkirina xwarinan de. 6.Dengê baranê 10.Alaveke şer yê kevin. 11.Xwezî, lava 12.Alaveke kevin ê ku rûn, dimis û tiştên malê tê de dihatin hilanîn. 15.Danekî rojê 17.Du zarokên ku bi hevre çêdibin. 18.xwarineke avî (berevajî). 20.Gundeke dîrokî yê girêdayî Nisêbînê. 23.Rengek 24.Diyariya herî bi nav û deng ku mirov didin hev. 27.Neyênî

**Bersiva hefteya borî**



# Çend çîvanokên kurt

Abas Ismaîl

## Misînkê malbava

**Kurê malê qawe anî ji xezûrê xwe re, xalê mêvan gote zavayê xwe :** "Çaxa me keça xwe da te, te digot ez ji mezinê xalida me. Belê bi xwedê ev misînkê qawa te yê mitirba ye." **Xwediyê malê ji xezûrê xwe re got:** "Bi xwedê pîreka min ev misînk çaxa bûkaniyê ji mala bavê xwe anî."

## Qurban

**Yekî ji Ebdîko re got :** "Min şeva çûyî bavê te di xewnê de dît, ji min re got, gelek silavan li kurê min Ebdî bike da ku qurbanekê li min bide" , **Ebdîko got :** "Ma lawo beriya çar rojan min mihek serjêkir û te bixwe jê xwar. **Hevalê wî got :** "Bi xwedê min ev jê re got , belê ewî got : raste belê ew qurban miriya ji min stand." **Ebdîko got :** "Hema bi namûs ez sed beranê soringkirî lê bidim wê mirî jê bistînin. Ma ez dizanim bavê min çi tirsoneke , mane her roj ji ber diya min digriya."

## Yê Meskenî û caw

Yê cawfiroş hat gundê Meskenê li ser bêndera rastî yekî hat, dît ku terîşek bi tenê di sitûkura wî de maye, bi kêf jê re got: "Birako ma cil û caw ji we re ne gereke?"

**Ewî got :** "Yê min bixwe ji min re ne gereke!"

## Pîvaz diz

Yê cawfiroş hat gundê Meskenê li ser bêndera rastî yekî hat, dît ku terîşek bi tenê di sitûkura wî de maye, bi kêf jê re got: "Birako ma cil û caw ji we re ne gereke?"

**Ewî got :** "Yê min bixwe ji min re ne gereke!"

## Tir li ku û das li ku

Sermelek (serokê palevanan ) rojekê das li lingê xwe xist, rabû yekî pale jê re got: "Tu dibêjî ez zîrek im çawa te das li xwe xist mal xerab." **Sermelek lê vegerand û jê re got:** "Ma te çima wê rojê tirek kir?" **Yê din bersiva wî da û got :** "Tew , tew tir li ku û das li ku."

## Yê deyndar

Yê deyndar fîke fîka wî bû zincîra xwe li ba dikir li gastîna Golê digeriya. Xwediyê pera çend carekê ew didît û doza perê xwe lê dikir, belê ewî xwe kerr dikir û qapaniya xwe bernedida rabû xwediyê pera rojekê bi qemçika wî girt û jê re got: "Kuro vê qapaniya xwe berde û ez nema doza deynê dikim."

## Kefenê kin


**Mela ji kurê yê mirî re got:** "Hiso kefenê bavê te kin e, di ser kabokê re ye here Midyadê gazek cawê din bîne." **Kurê yê mirî got:** "De seyda wî bipêçe ma qey wê here govendê."

# Hunera Heftemîn; sînema

Veysî Altay

Sînema weke “Hunera Heftemîn” tê binavkirin. Di nav de wekî wêne, muzîk, wêje û şano jî hene û hemûyan di nav xwe de dihewîne. Mirov bi saya hunera sînemayê cihên ku qet nedîtine dibîne û tiştên ku hay ji wan tune ye hîn dibe. Sînema dikare bi demê re hemû sînor û pêşdaraziyan tune bike û ji bo fêmkirin, hevnasîn û ragihandina mirovan û rojevkirina pirsgirêkên jiyanê bibe amûreke gelek girîng. Sînema cîhaneke bêserî û bêbinî ye, pir kûr û berfireh e û mirov di nav de xwe wenda jî dike û paşê jî xwe ji nû ve kifş dike. Di cîhanê de sînema pir bi pêş ketiye. Zêdehî netewe, bi zimanê sînemayê xwe îfade dikin. Derd, kul, kêfxweşî û berxwedana xwe bi zimanê sînemayê bi me didin nasîn. Van demên dawîn kurd jî hêdî hêdî têkoşîna xwe bi zêdehî bi awayekî polîtîk bi rêya sînemayê tînin ziman. Sînema di qadên têkoşîna azadiya kurdan de hêdî hêdî dibe zimanê herî girîng û herî çalak ê propagandaya rasteqîn…

Her çiqas destpêka sînemaya kurdî filma “Zarê” (1926) yê derhênerê ermen Hamo Beknazaryan tê qebûlkirin jî, di heman demê de derhênerên alman û Sovyetê jî li ser kurdan hin fîlmên kurdî çêkirine. Piştre jî, bi taybetî li Ewropayê û li gelek welatên cîhanê li ser kurdan filmên metrajdirêj, kurtefîlm û belgefîlm kişandin. Lê mirov dikare bi rehetî bibêje ku hejmarên van filman, pir kêm bûn û zêdehî jî kurd û çanda kurdan şaş dihate nasandin. Yên li ser kurdan filmên herî zêde kişandine jî sînemagerên tirk bûn. Li ser axa Kurdistanê, zimanê kurdan, jin, zarok mêrên kurdan sed sal in ku bi polîtîkayeke taybet filman dikişînin. Bi vî awayî hemû nirxên kurdan serobino dikin. Di hişmendiya mirovan de fikra tirkbûn û dagirkeriyê dixwazin ava bikin. Demekê, li hemberî van şaşiyan bi rastî jî ji destê kurdan tiştek nedihat û kurdan jî bi awayekî xizmeta van polîtîkayan dikir. Ji ber ku, her çiqas rêxistinên kurdan ên biçûk hebûna jî, kurd zêde bi rêxistin nebûn. Çar parçeyên Kurdistanê ji aliyên dewletên dagirker ve dagirkirî bûn. Ziman, çand, huner û hwd… qedexe bûn. Kengî kurdan li hemberî dagirkerên xwe, têkoşîn da destpêkirin; sînema jî, wek her qadê hêdî hêdî rabû ser piyan û dest bi afirandina berhemên xwe kir. Sînemagerên kurd di sînemayê de bi navê “Sînemaya Berxwedêr”, çîrok û serkeftinên xwe kişandin kirin film. Di van salên dawî de li çar parçeyên Kurdistan û li Ewropayê hejmara filmên kurdî zêdetir bûne. Kurtefilm, belgefîlm, anîmasyon û fîlmên metrajdirêj ên kurdî di mihrîcanên filman ên navneteweyî de tên nîşandan û xelatan werdigirin û dengê xwe radigihînin cîhanê. Derhênerên kurd bala cîhanê dikişînin. Di heman demê de mihrîcanên filman ên kurdan jî zêde dibin. Li Bakur, Başûr, Rojava, Ewropa û Tirkiyeyê bi dehan mihrîcanên filman ên kurdan tên çêkirin. Her çiqas em behsa kêmasî û xeletiyên li ser naverok û rêbazên mihrîcanan bikin jî, di heman demê de, ev tê wateya roj bi roj pêşketina sînemaya kurd jî.




Di serî de mirov dikare behsa kêmasiyên; bandora hişmendiya dagirkeriyê ya li ser sînemaya kurdî; qelsbûna di nav wêje û sînemageriyê de; nêzîkatiya rêxistin û saziyên kurdan; têkiliya sînemavan û temaşevanan; bêrixistinbûna sînemavanên kurd, têkiliya sînemavan û çapemeniyê; kêmasiya mihrîcanan, nîşandan û belavkirina filman; tunebûna polîtîkaya li ser sînemayê, aborî û hwd. bike. Ev hemû sedemên qelsbûna sînemaya kurdî ne. Û her pirsgirêk pêwîst e ku hûr û kûr ji aliyê sînemagerên kurd ve werin nîqaşkirin. Ji bo jiholêrakirina van qelsbûna, divê em di serî de sinemaya cîhanê baş bişopînin; ji axa xwe, çîrokên xwe sûd vebigrin; di her beşên sînemayê de xwe perwerde bikin û pêş bixin; ya herî girîng jî, guh bidin dengbêjê sînemayê Yilmaz Guney û pêşengê sînemaya çiyê Halîl Dag. Her du derhêner jî, di şertên pir dijwar de ji bo gelên bindest sînemayeke pir bi bandor çêkirine. Filmên ku afirandine hê jî, bi milyonan kes li wan filman temaşe dikin û bandoreke erênî werdigirin. Di nav şert û mercên dijwar de, bi zemanekî resen, sekneke berxwedêr, ji sînemaya kurdan re bingehek ava kir. Her çiqas film hatibin qedexekirin jî, ew film, bi awayekî gihîştin malên hemû kurdan, kopiyên filman hatin zêdekirin û belavkirin. Îro jî em dibînin ku astengî û qedexe li hemberî çand û hunera kurdan berdewam e. Lê em ne yên bê rê ne, her tim em dikarin bi hewldanên xwe ji xwe re, ji bo sînemaya azad rêyeke din bibînin û vekin.



Weswese 2

Şener Ozmen

## Ka şewqeyên we!?


Di hevpeyvîneke *Der Spiegelê* de ya di sala 1969'an de bi Adornoyî re kirî, guftûgoyeke baldar derbas dibe: *“Birêz profesor, wer dizanim ku dubîlî dinyayê îş têl bû.”* Adorno: *“Lê ji min ve wisa xuya nedikir.”*


**Huner û tiştanok**

Adorno, weke tiştanokan ranêzîkî berhemên hunerî dibû, li gorî wî berhemên bi vî cureyî, fena tiştanokên wênedar, xwediyê xwe û razekê bûn, jixwe çîrokên di berheman de jî bi devê perîzadeyan dipeyivîn: *“Tu daw û doza ya/yê teqez dikî, dê ew ya/yê te be, lê tu kes dê guh li vê yekê nebe.”* Xisletê tiştanokî yê di berhemên hunerî de, li gorî teoriya estetîkî ya Adornoyî –Adorno vê nêzîktêdayina xwe li ser bîr û boçûnên Benjaminî ava kiribû–ango, berhemên hunerî yên ku diviya weke tiştanokan bêne şirovekirin û tehlîlkirin, bêguman ji bîr û baweriya wî ya ji hunerê –û ji hêza wê–dihat ku îro ro, em bêgav in wekî vê nêzîktêdayînê rexne bikin. Per û baskên perîzadeyên ku ji hunerê re bûbûn per û bask, bi maytêkirina şirîkeyên fînansê yên navneteweyî re, bi awayekî ku bi tu caran û bi tu destekariyê necebire, hatibûn şikênandin. Hunermend, ne li dû tiştanokan bûn êdî, wêneyek hebûya jî, ji bilî agahiyeke lawaz a estetîzekirî, çu tiştekî razbar a ku me li dû xwe kaş û berkaş bike, nedîda me. Nexwe huner, temsîla çi bû û temsîla çi dikir? Di demên wihakîno de gelo teoriya rexneyî ya hunerê bi kêrî çi dihat? Huner, çawan dibû ku wekî bersiva tiştanoka bûneweriyê –vê kêşeya ontolojîk!– dabe, bi vê quretiyê vediguhezî tiştanokeke din a hîç û pûç?

**Kurdbûyîn çima dibe Toqa Şeytên?**

Li bakurê Kurdistanê, ji ber ku tu kelepor û paşxaneya hunerî yên hunermendên me yên hevçax tune bû wekî xwe bispêrînê, rabûn xwe bi zorê xistin nav mêjûya hunerî ya tirkan. Ji bo hunermendeke/î tirk girîngiya pêwendiyên têgihî yên ku di ser STT'ê (Koma Pênaseyê Ya Hunerî ku di sala 1977'an de, bi pêşengiya hunermend û akademîsyên wek *Şükrü Aysan, Serhat Kiraz, Ahmet Öktem* û *Avni Yamanerî* dest bi xebatên xwe yên têgihîkiribûn ên bi felsefe, zanist, mentiq û matematîkê ve têkildar bûn) re ava bûbûn, piştî demekê bo hunermendên kurd jî derbasbar bû û kurd, mêjûya nûjen a hunerê di ser van bîr û boçûnên rojavayî re, bêyî ku bikevin tu dûdiliyê, weke mêjûya xwe ya destpêkê pejirandin. Ji nifşê pêşîn tu hunermend ji akademiyê nehatibûn, perwerdeya hunerî ya ku li Zankoya Çukurovayê, di Beşa Mamostetiya Karên Şêwekariyê de dîtibûn, têraşer û pevçûneke bilind ya estetîkî û teorîk nedikir. Bi tenê rêyek hebû li pêşiya wan, ew jî ‘siyaset’ û ‘nasname’ya wan bû ya ku bûbû barê pişta wan, ku bi demê re (di navbera sala 2000-2010'an de), ev herdu kart jî, digel encamên bêdewletiyê û ezmûngeriyeke dûvedirêj ya di vî warî de,weke jokerê hate bikaranîn. Berteka pêşîn ku min di nav nivîsên xwe yên Xwebûnê de qala vê kiribû, ev bû: hunermendên ku beşdarî li *Çaremîn Pêşengeha Çalakiyên Civanan* (Stembol, 1998) kiribûn, wek sixûrên çandî yên ku pirsgirêkên herêma xwe vediguhastin hêwanên pêşengehan, hatibûn binavkirin. Di tezên civaknasên tirkan de berteka hunermendên kurd, bûbû mijarine hema hema balkêş. Kurd di hunera hevçax de hebûna jî, bivênevê dê bi pirsgirêkên xwe hebûna, berhemek –berhem helwêst e–gava derveyî vê ‘Toqa Şeytên’ bihata afirandin, di derûdorên hunerî de bi dest re tuşî dijraberiyeke seyr dihat. Li gorî vê xwendina bijarteyî ya konformîst, li wê herêmê (giva li başûrê rojhilata Tirkiyeyê) bi tenê zarokên kurdan dimirin (çi ku dimiriyan, nedihatin kujtin). Hê beriya bi çendekê, li Dêrsimê, ji bo herdu birayên ku pê li teqemeniyê kiribûn û jiyana xwe ji dest dabûn, kuratoreke navdar (Beral Madraya ku bi demekê Amed ji xwe re kiribû wargeha hunerê), gotibû; *“Bi tevî vê heqîqetê jî, van herdu zarokên biçûk dişînin deverê, ji ber hindê dê û bav sûcdar in…”* Qey Baudrillard bû yê ku digot; *“Tiştin hene ku li derveyî heqîqet û berahiyê mane û li dijî me li ber xwe didin.”*





**Ka şewqeyên we!?**

Ji tirs û şayîşa ku hunermendên me, wek kurdekê/î neyên destnîşankirin û ji gera ‘neteweyî û navneteweyî’ bêpar nemînin, kar û barên wan bên firotin û têkevin pêşengeh û koleksîyonan, wêdetir ji hemûyan di gergerineka nasnameyê de winda nebin û neyên recimandin, xwe bi havilnameyên dem û dezgehên ku piştgiriyê didan projeyên wan ên ji herêmê derçûyî, kedî kirin. Mijarên ku li Kurdistanê resen û pesen bûn (wek kujtina Tahir Elçiyî), ji Stenbolê re hema qet nedibûn (çi ku Stenbol ne bajarekî gilî û gazincên herêmî bû), piştî demekê ‘Tirkiye’ dê ji hemûyan re bûbûya *‘Welatê me’*. Berhemên ku qala mêrkujiya li welêt dikirin, helbet ne di hunkûfê hiş û bîra hunermendên têgihî yên ku li rabirdûya ermenan (bo minak li destemeliya wan a di warê çêkirina şewqeyên jinan de) hûr dibûn bû.

Ji nifşê hunera têgihî *(Conseptual Art)* mînaka herî balkêş, Sarkîs bû û Sarkîs, ji bo ku bi eslê xwe ve ermen bû, di nav vê mêjûya nijadperest de zû bi zû hatibû recimandin. Sezer Tansugku yek ji ekterê herî girîng ê hunera nûjen û rexnegiriya hunerê bû, bi boneya pêşengeha Sarkîsî ya li Venedîkê (di sala 1990'an de li dar ketibû), li Dêra Katolîk a Ermenan a li Girava San Lazarroyê li dar xistî, ji ermenbûna hunermend bigire heya qaşogiravî xinizkariya wî ya neteweyî, ew dabû ber tirên xwe yên jehrîn. Hingê, nivîskar û hunermendên wek Melih Cevdet Anday, Murat Belge, Can Yücel, Onat Kutlar, Ferit Edgü, Enis Batur û Handan Börüteçene, gotinên Sezer Tansugî, bi belavokekê şermezar kiribûn. Di belavokê de; *“Em ên ku bi hêz û qudreta aştîxwaz a hunerê, lê ne bi hêza wê ya veqetîner bawer in, em ên ku li dijî bîr û boçûnên cudahiya regezî, ya zimanî, olî, reng û zayendî ne… hiş û bîra paşverû ya nivîskêr şermezar dikin!”* hatibû nivîsandin.

**Bo bibîrxistinê:** Sarkîs, di sala 1969'an de tev li pêşengeha pîrê kuratorên serbixwe Harald Szeemannî ya bi navê *Gava Helwêst Vediguhezin Şêweyê* de cî girtibû ku ev pêşangeh wekî yekemîn pêşangeha têgihî ya pêkveyî hatibû pejirandin. Di salên 60'î de dewleta tirkan, ji bo hunermendên tirk hînî formên nû yên rojavayî bibin û xwe di warê hunerê de perwerde bikin, dişandin Parîsê. Gelek ji wan bi rêya bûrsên dewletê, hinek jî bi derfetên xwe qesta welatên dereke kiribûn, yên wek *Füsun Onur, Nil Yalter, İsmail Sayar,* bi vê qonaxê re û piştî vê qonaxê, dev ji şêweyên bênahiyên kevneşopî ya ku di akademiyê de dihat bi nan û av kirin, berda bûn û berê xwe dabûn pratîk û pêşangehên ezmûnî *(experimental).*

xwebûn

13-19 Nisan 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 17


*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85

# Qiblegeha rojperestan; Soxmatar

Keştiya Alalû
**Agît Yazar**





Bajarê antîk ê Soxmatarê di nîvê sêkujiya navçeya Herran, Wêranşar û Serêkaniyê de ye. Bajar, di nava girikên ji tahtên yekpare pêk tê de hatiye avakirin. Li ser heft girên li derdora bajarê antîk ê Soxmatarê, perestegeh yaxwud resetxane hatine çêkirin. Girikek ji van girên hanê, bi temamî bi destan hatiye çêkirin. Bajar, li ser vî girê çêker û li derdora wî hatiye avakirin.

Li derdora Soxmatarê, bi dehan bîrên ji tahtê hatine kolan henin û bîrek ji wan bîran jî tê bawerkirin ku ew bîra Hz Mûsa hatiye av jê vexwariye û li ser wê bîrê qîzên Hz Şuayp yên şivan naskirine.

Dîsa gelek şikeftên bi destan ji tahtên yekpare hatine kolandin, li derdora bajarê antîk ê Soxmatarê henin.

Her çiqas Soxmatar hezar û heştsed sal berê ji hêla împeratoriya Romayê ve hatibe avakirin û şopên qiraliyeta Abgarê lê  hebin jî, em dizanin ku dîroka Soxmatarê gelekî ji van şaristaniyan kevintir e. Heta niha hema di ser re xebatên arekolojîk hatiye kirin. Di vê xebatên di ser re de jî, dîsa li bermahiyê ku dîroka wan xwe dispêre heta derdora pênc hezar sal beriya niha, hatine tesbîtkirin

**Bîra Hz Mûsa**

Riwayet ew e ku wexta Hz Mûsa ji ber Ramsesê duyemîn direve, tê bi Mezopotamya jorîn re devdikeve. Li Soxmatarê li ser bîrekê li hinek şivanan rast tê û bi vî awayî her sê qîzên Hz Şuayp yên şivan nas dike. (Ev bîra navbor, tam di nîvê bajarê antîk ê Soxmatarê de ye û hîn jî nişetecihên herêmê, nexasim jî şivan ji ava wê sûdê werdigrin.)

Hz Mûsa bi qîzeke Hz Şuayp re dizewice û di berdêla nextê wê de derdora deh salan ji Hz Şuayp re şivaniyê dike. Hz Şuayp merivekî alîm û zana bûye. Loma jî Hz Mûsa li ber destê wî baş têdigihêje, serwext dibe û dikemile. Hz Mûsa, hemû pilansaziya rizgarkirina xelkê xwe yên Benî-Îsaraîlî li vê herêmê pêk tîne.

Di vê xalê de, pêla pirsekê xwe li keviya hişê meriv dixîne: Gelo baweriya ola ezmanî ya yek-xwedayî, di nav Mîtaniyên bawermend de ji Hz Mûsa re çêbûye? Lewra di wê serdemê de, tenê Mîtanî di wê herêmê de dijiyan.

**Hz Îbrahîm Sîn û Şamaş**

Di kitêbên pîroz de derbas dibin, dibêjin çar hezar sal beriya niha, rimildarên qral Nemrûd/Nemird rimlên xwe davêjin û li wan iyan tê ku ew ê di nav salekê de kurukek ji diya xwe bibe û ew ê qral Nemrûd bibe helakê. Her wekî tê zanîn, ew kurik ji Hz Îbrahîm pê ve ne ti kesekî din e.

Wexta meriv li perestegeha Sîn û Şamaş a Soxmatarê digere, meriv li şopên piştrastkirina vê yekê rast tê. Lewma dîrok û devera vê bûyara dîrokî li hev tên. Dîsa sembolên wekî roj, heyv û stêrk sembolên vê bûyerê yên sereke û ev sembolên hanê li perstegeha Soxmatarê sembolên diyarde yên hebandina baweriyê ne.

Her wekî tê zanîn ku ewil Hz Îbrahîm jî ji rojê bawer kiriye. Piştî roj diçe ava, Hz Îbrahîm hêvîşikestî dibe. Paşê heyv hiltê û bilind dibe. Xwe bi xwe ji xwe re dibêje, hebe tine be ev e rebê min. Lê paşê heyv jî diçe ava. Vêca bi şev stêrk dibiriqin û dîsa Hz Îbrahîm dibêje hebe tine be stêrk rebê min e. Lê axir dibe sibe û ew jî wenda dibin. Di dawiya dawî de Hz Îbrahîm biryarê dide û dibêje yên hilbên û paşê herin ava nabe ew bibin rebê min. Bi vî awayî hizra afirînerê tevahiya vê gerdûnê bi Hz Îbrahîm re çêdibe û bi vî awayî baweriyê bi rebê roj, heyv û stêrkan tîne. Bi wateyeke din, Hz Îbrahîm ne bi roj, heyv û stêrkan, bi wê hêza ku roj, heyv û stêrkan dixîne nav liv û tevgerê û afirînerê gerdûnê ye ji xwe re wekî reb dihebîne.

**A bi vê roka di ser min re!**

Kurdên reş ango kurdên Mîrî, bi wateyeke din kurdên heqîqî bi wateya vê sonda "a bi vê roka di ser min re!" baş dizanin. Wexa em zarok bûn û me li biniya gund ji xwe re bi hev re dilîstin, yek caran di navbera me de dubendî derdiket. Hingê ji bo heqî û neheqî ji hev werin safîkirin, me hevdu didan li ber sondê. Kesê berê xwe bida rojê, çavê xwe ji ber tîrêjên rojê bikustkutanda û bi devekî tije sond bixwara, bigota "a bi vê roka di ser min re min hîle nekiriye!" dahwe safî dibû.

Lewra me baş pê dizanîbû, tu kes ji me culhet nake ku bi derewan sondeke wanî bixwe. Di dawiya dawî de roj tiştekî pîroz bû û kesên bi derewan bi wê sond bixwarana, rojê ew ji herdu çavên wan dikir û hutim-kor dibûn. Bawerî ev bû!

Hevalekî me ê zarokatiyê hebû. Navê wî Birhano bû. Ti kafira pêl li wî nekiribû; tim û daîm hîla xwe li me dikir. Çaxa me sonda ka hela ji me re sond bixwe bibêje "a bi vê roka di ser min re min hîle nekiriye" dida li ber Birhano. Hingê kenekî muzur li ser rûyê Birhano belav dibû û ji bêgavî hîla xwe li xwe mukur dihat.

Belê ev sonda baweriya bi rojê, baweriya serê hezaran salan e ku di nav demajoyê de hatiye heta roja me ya niha û ji ber xwe ve, awayekî bi awayan hîn jî em vê baweriya xwe a qedîm dikudînin. Ji bo esaleta miletekî ev jî cihê şanaziyê ye.

**Sîn Şamaş û baweriya bi rojê**

Li gundê Soxmatarê li nav qiblegaha rojperestan digerim. Vê niqlê rehbera min, qîzikek porgijik e. Navê wê Şemsê ye. Navê Şemsê tê wateya rojê. Ez ji Şemsê tika dikim ku yekser min bibe ba kêlber/rolyefê Sîn û Şamaş.

Ez û Şemsê em bi girê ji tahtekî yekpare pêk tê ve radipelikin. Yek û dudu em derdikevin serê gir. Li serê gir, kêlbera Sîn û Şamaş me pêşwazî dikin. Sîn xwedawenda heyvê û Şamaş  jî Yezdanê rojê ye. Heta ji min tê ez empatîya kesê beriya niha bi hezaran sal berê dikim û spasiya afirînerê roj û heyvê dikim.

Enerijyek welê min rapêça bû, min bi qasî çivîka beytikê xwe sivik hest dikir; hema min digot qey ez baskên xwe li hev bixînim, ez ê bibêjim pirt û bifirim.

Berê xwe ber bi başûr, ber bi Serêkaniyê ve dadigerînim; navê xwe yê hingê jê re digotin Waşûkanî. Ez çavê xwe noqav dikim û paytexta Mîtaniyan tînim berê çavên xwe; ez diçim 3 hezar 500 sal beriya niha. Pişta min li perestegeha Sîn û Şamaşê ye, berê min li pêşiyên me yên Mîtanî ye. Nizanim çima! Hema ji ber xwe ve ez girêdanekê di navbera Mîtanî, Mîtra, Sîn-Şamaş, Hz Îbrahîm û Zerdeşt pêxember de datînim. Paşê kerwanekî berbûkên misirî li ber çavên min dikevin. Evan berbûkan dihatin dotmîra Mîtaniyan a bi navê Nefertîtî ji Amon Hotep ê çarem re siwar dikir. Sazbendan, aletên xwe yên entîke dicoşandin. Hinek ji wan bi bilûrên xwe yên ji hestiyên çîpên ajalan dixistin. Hinek ji wan li erbaneyên ji çermên xezalan dixistin û hinek ji wan jî li lîrên xwe yên ji bijiyên qemçên hespan dixistin. Paşê jî bi lîrelîr, bi helahela Nefertîtiya bedew siwar dikin û berê xwe didin Misira qedîm.

Dotmîra Mîtaniyan, Nefertîtiya bedew a ku Fîrewnên Misirî jî ber bedewiya wê, ola xwe ya serê salan guherand û hatin li ser ola wê ya ji xwedayê rojê bawer dikir. Heta Amon Hotep navê xwe jî guherand û kir Ake Naton û ew jî bû bawermendê xwedayê rojê.

Mîna ez li ser girê Soxmatarê hatibim trûzkandina dem û dewranên kevnar, wanî bi girûzîn bi xwe vedihesim. Ez dinêrim tîna tîrêjên roja di kokevaniya ezmanê lacîwertî de diçe xwar, gepa min a rastê sincirandiye. Cardin ez dadikevim li ber kêlbera Sîn û Şamaşê û ez dîrozeke Zerdeştiyane pêşkêşî gerdûna bê ser û ber dikim.

